

GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kùltürel ve Sanatsal Dergi

Yıl:1 Sayı:6 Ekim-Kasım 1992 (İki Ayda Bir Yayınlanır) Fiyatı: 8000 TL. (KDV Dahil)



- ✓ BİRANIN...
- ✓ JİYANA MIN/ EKREM CEMİL PAŞA...
- ✓ KOMEL RESSAMLAR BİRLİĞİ İLE RÖPORTAJ...
- ✓ JI NAVA EDEBİYATA CİHANÊ/ NERUDA...
- ✓ ÇÊ SOSÊN BÊGÎ/ MÛNZÛR ÇEM...
- ✓ SERPÊHATİYA SİYABENDÊ SILIVÎ...
- ✓ NİŞTIMANA ME/ FARQÎN...

GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kùltürel ve Sanatsal Dergi

SAHİBİ

Mazhar KARA

SORUMLU YAZI İŞLERİ MÜDÜRÜ

Mükerrem AYYILDIZ

YÖNETİM VE YAZIŞMA ADRESİ

Gevran Cad. Şair Sırrı Hanım
Sok. Ustabaşı Apt. No:29
Zemin Kat Daire:1
OFİS/DİYARBAKIR
TLF/FAX: 213663

BANKA HESAP NO

Mazhar KARA Adına
T.C. Ziraat Bankası D.Bakır
Merkez Şubesi
35 37 64 Nolu cari Hesap

ABONE KOŞULLARI

6 AYLIK : 24.000

1 YILLIK : 48.000

İLAN TARİFESİ

Arka Kapak :750.000

İç Kapak :500.000

Tam Sayfa :300.000

Yarım Sayfa :150.000

1/4 Sayfa :75.000

DİZGİ:

EZGİ PRODÜKSİYON

TLF: 24 55 78 D.BAKIR

BASKI:

Aydınlık Matbaacılık

İÇİNDEKİLER / NAVEROK

Pêşgotin	1
Me Jiyanek Nû Darxist	
DILOVAN	2-3
Din ve Zerdüştlük	
KRONAHL	4-7
Jî Nav Edebiyata Cihanê "NERUDA"	
Jîyan MINARİ	8-10
Gelperwerek Hêja Jî Axa Amed	
Ekrem Cemil Paşa	11-16
Helbest / Şiir	
Kemal BURKAY	17
Dî Navbera Salên 1979 û 1980'yan de Rewşa...	
L.ÖZDEMİR	18-22
Bêjeyên Yek Manê An Ji Nêzikê Hev	
VAZGAL	23-26
Röportaj	
Komel Ressamlar Birliğı	27-33
Nîştîmana Me " FARQÎN "	
S. KORKMAZ	34-37
Serpêhatiya Siyamendê Sîlvî	
MEKMEN	38-40
Çê Sosên Bêgi	
Munzur ÇEM	41-44
Helbest / Emê Gozê - Mîcoyê Qulpi	45
Jî Bo Zarokan / FABL	
Cudî CIZIRÎ	46-47
Xaçerêz û Pêkenî	48
Jî Xwendevanan	
Eskerê Boyik	49

PÊŞGOTIN

Dî rewşa iroyîn de lî welatê me jiyan wek xwin sor û xwin jî sor wek jiyanê diherike.

Govend dî van rojên rengê xwin de, dî vi kekel û germa şoreşa azadiyê de, rûpelên xwe jî bona xwendevanê xwe bi eşq dixemilîne. Bê şik, ev rengê jiyanê, ew rengê sor radihêle rûkê rûpelên Govendê jî.

Dî vi rewşa sor da dîsa mîrîn û jiyan wek tabloyekî, wek wan rengên ku tabloyekî (weneyekî) rengin dixemilînin, lî cem hewîn û hev dû xurt dîkîn. Apeki Musa hin dî heftsaliya xwe da ye, yê din jî dî heftê û çar saliya xwe da bi destê hêzên kolonyalistên kevnare û xwinmij hate qetulkirin.

Xwina Apê Musa rengê jiyanê bêtir sor kir. Ewî porê xwe yê sîpiyê qerqas bi xwina sor hine kir.

Apê Musa, şervanek kal, porsîpi, hûnermendekî jir û zana, pîspore çand û edebiyata gelê xwe yê bîndest û nîskarekî xort û jêhati bû.

Ew, jî wi kula dilê gelê xwe ra "Bîrina Reş" gotibû. Lê pozê "TIR" a xwe, pozê wiyê tûj, sîpartibû nava kezêba dijminê xwinmij, lema dî heftê û çar saliya xwe de, singê wi bû nişana guleyên neyaran.

Wê qelêma Apê Musa lî erdê nemîne!

Dî nava vi kekelê jiyanê, jiyanê rengê xwinê de jî Govend hazîriya xwe ya jî bona pêşerojê xurtir dimeşîne; ê rûpelê xwe jî 32 yan derxist 48'tan. Wê jî vir wiha bêtir cih bide çand, edebiyat û temami cûreyên hunermendiyê.

Dî nava borina wan her du meha da, bîrîyara here girîn jî bona Govendê ewe ku hêz daye xwe jî bona bibe pîre, dî navbera çandî û hunermendiya gelê kurdê lî çaralê dinyê û Amed a rengin jî jî bona vi Şîxulê gîranbûha bike navend.

Govend bi jîmara xwe ya şeşan (ev jîmara dî destê we da); salekî xwe tîjî kir. Ew bû yeksalî

Dî dû yeksaliya xwe ra wê hin xurtir û bedewtir bihê destê we xwendevanê delal.

Bi silavên Şoreşgerî...

GOVEND

DILOVAN

Payizên serhedê bî bah û bahoz û baranîn. Roj kîn, şev kûr û dûr reş û dirêj in. Lê hinek roja, germa tavê wek kelekela destê dayikan, rû yên mîrov germ dîke. Wan rûyên ku lî ber sûr û sermayê sor qimûlin e...

Em çar heb hevalên xwendevaniyê bûn, salên me di navbera 13-16 da bûn. Dî dilê med şabûna çûyin û dîtina bajêr, destpêka jiyaneke nû û hinbûn û elîmandîna tiştên xerib. Destpêka xwendin a dibistan a navîn, qetandin a jî malbatê, jî bav û dê, jî xwişk û bira, jî heval û hogîra, jî gönd, ew gund ku ciyê leyztikên meyên zarotiyê bû. Temkîrîna jiyana bajar... Wek jî dunyayê mîrov berê xwe bide merixê. Em herçar heval jî bî yek dilek nava xem û xeyalan da difirîyan. Çûyina bajar... Destpêka dibîstana navîn... Hinbûna Tîrki û hin tiştên din....

Me jî xwe ra xaniyek kîrê kîrîbû, pîrtûka sitendîbû, pênuşê meyê nû hebûn û defterê meyên pel sîpi... Ew yeka bû, Sedemê dîlşaiya meya kûvî, ya bê ser û ber.

Tatos... Çûyina tatosê bira jî jî mera bû dunyaki nû, destpêka dibîstana navîn bû destpêka jiyaneke şoreşgerî. Jî ber ku em çar heb şoreşgerên piçûk bûn, çar dilên zarok...

Tatos, dînava birçî bûn û tazîti û sermayê serhedê da navê feqîriyê û sermayê ye. Paştamayîn tu dibê qeyê

nivîsara eniya wî ye. Lê dîsi jî dînava wî sur û sermayê da dilên mîrovên wî wek çengeki bîhêşt germ û xweşe. Kefa destên wîr qalîndin wek germa rojan, tema nanâ tendûrê jê tîn.

Ew xaniyê me herçar hevalan jî xwera kîrê kîrîbû wek her xaniyeke tetosê; diwarê wî kevîr û xwelî, serê wî dar û xwelî bû. Derî û pencere jî textîka hatîbûn çêkîrîn û bî naylôn û kulav va hatîbûn nîxamtîn. Xaniyê Tatosê jî xwelî bû lê disa jî ew ne wek gundê me bû. Sûkek wîyê piçûk hebû, dîkanan wê, qehwexanên wî hebûn. Televîzyon jî tişteke pîr xerib bû, ew jî me lîwîra lî totosê dît, lê temaşekîr û em ecêb mayî man. Çiqas jî hebe tatos jî bajar bû.

Sal 1978, roj wek çemê Erez dînerîkîn, me tema pîrtûk ên qalîn, qelemên nû û rûpelên sîpi derdixîst. Dî nava wan çenda da kovarek e nû gihiştîbû destê me. Kovara xweş a bedew; ew dunyaki jî dibîstanê û jî jiyana bajêr jî wêdatîr û xêştîr bû. Ew kowar di navbera me û dunyêda bû wek pacekî heşîn a zelal, em kaşîrîn û bîrîn çaxekî dîn. Eşqa xwendîne û zanî ê dî dilê meda zêde tîr kîr. Rojên me bî xwendîne diçûn ava û bî xwendîne dîdan der. Serma û bah û bahoz di nava dilên germda zûda hatîbûn jî bîrkîrîn. Dî nava her çar dûwarê xwelî û kevîrên reşda, dunya kî germ û ronî

dikeli. Pêda, pêda dengê şoreşgeran baştir dîgiha me: "Emêjiyanek e xweştir darxinin... Emê hêviyê, aşitiyê û azadiyê binin..." Van dangan em ber bî rojê kışandin, germa dilê hevalan wa ye jî nûha da têk jî sermayê bir...

Roj, rojek jî wan rojân payizên serhedê bû; sar bû derva. Ewrê şiliyê rûkê ezman tari kiribû û gurina ewran bû, birûzkê davit, vedîda. Ew roj hevalên min nelimalbûn, ez bitenê dînava çar dûwarê xwelida, lî ser sewkiyê rûniştibûm, lî ser çokê min Kovara Riya Azadi û ez dînava rûpeli wida lî dunyaki xweş û germ dîgeriyam. Ketîbûm nava xem û xeyalên kûr û rengin dî ser ewranra, lî asimana dîgeriyam. Lê lî derva şiliyek jî wan şiliyên dawîya salê dest pîkîr bû û bî kerb dîbariya.

Ez bî xuşîna avâ ra hişyar bûm. Hişarbûna ku ez hişar bûm û min bala xedayê, çî binhêrîm, pirtûk û defterê me, çek û çolê me, nanê me, sergginê me, heyani bigire nivînê me, gîşt bî ser avê ketin e, xuşîna av tîjeyî mal dibe. Ez rabûm ser xwe lê nîkaribûm jî ser sewkiyê peyayê jêr bûma. Hûdur av tîjiye û lîderva tu dibê qeyê devê kûza berjêr kirîna û jî ezmanda av tê xarê.

Dî destê min da kovaramin û bê çare qasekî lî ser sewkiyê rûniştim. Lê sekan dermanê tu tîşteki nine; Ev rewş çare dîxaze. Wek dî kovara min a delal da jî dînivise.

Min şapîkê xwe derani û da nava avê. Bî wan destê xweyê pîçûk jî derve kevîr û xwelî kîşan û pêşîya avê da birin. Paşê pirtûk û çek û çolan jî ser avê topkîr dani ciyekî bîlin. Dî dû ra min rahişt e elbîk a avê û avê jî malê

kîşan û rîjand e derva. Dî hînda mala mera hînek meriv derbas dî bûn lî min dînhêrîm, çîpê min tazîbûn û min fedî jî dîkîr...

Şiliyê hêdî hêdî kêmbû û tesîra xwe windakîr. Dî dû şiliyê ra bahekî sar destpêkîr. Hevalên min hatin û çend hevalên din jî bî xwera anîn. Me dest û mîl da hev avê jî malê kîşan û sefîkîr. Lê pel û potê me. sergin û şewatê me tevde şîl bîbû. Hundurê malê şîl û pîl ma.

Hîn kesan bî vî halê me tînazê xwe dîkîrîn. hîneka jî heyf û gunê xwe bî me tanîn. Jînên taxê lî ser kaniyê kom bîbûn lî me temaşê dîkîrîn. Dîkeniyan jî ber ku ev tîşt jî wanra pîr xerîb dîhat; "mêr û kar û şîxulên nava malê" ew tîşt bî hev nedîketîn, wan tîştê wîha nedîbûn. Xebata mîra dî nav maleda şerme; lî Tatosê ev tîşt toreya e.

Hevalên meyên şoreşger êvarê jî em bitenê nehiştin. Heryekî jî mala xwe jî mera kêmasiyek e me anîn; hîneka nîvin, hîneka sergin anîn û sobe ya me dadan û hundur germ kîrîn. Me sê heb nîvin peydakîr ew şev, ciyê me germ bû û me bîhevra dest xwendîna kovara xwe kîr çîxas xweş bû... Dînava sê heb ciyan da em deh heval çîxas xweş razabûn ew şev. Dî himêza meda jî kovara me...

Alikariyê wan hevalan, lî serhedê wî şeva payîz a sar a cemîdî germkîr. Ew roj me bî vî awayê jîyaneke nû darxîst. Bî şefeqa serê sibehêra em heryek wek kevokek sîpî hişar bûn jî wî xewa şîrîn.

Û me bîhevra qêr kîr: "merheba jî tera, merheba jin..."

KÜRTLERDE DİN ve ZERDÜŞTLÜK

-I-

K.RONAHİ

Kürt tarihi bir talan ve yoksayılma tarihidir, onların tarihi Arap, Fars, Türk ve diğer literatürlerde hep başka milletlere mal edilmiş onların şan ve şerefleri sayılmıştır. Bununla birlikte coğrafyası da bir talan, yangın ve savaş alanına çevrilen bu halkın tüm kültürel ve tarihi değeri ona geçmişinden kalan tüm arkeolojik değerleri yağmalanmış, imha anlamıyla, bu coğrafya bir "arkeoloji mezarlığı" haline çevrilmiştir.

Kürtler bugün için, bu tarihi karanlığından çıkarıp, gün ışığına çıkaracak olan gerekli kurum ve tekniği ve bu konuda yetişmiş antropologlara, arkeologlara sahip değildir. Ama onlar için orta yerde duran bu tarihin bilinmesi zorluluğudur. Bu yönde büyük bir güçle çalışma zorunluluğudur. Çünkü bu tarih kendi tarihidir. Kendisini geleceğe taşıyacak olan bu tarihtir. Üstelik bu tarih son derece zengin, pekçok artistik ve filozofik değeri olan bir tarihtir. Ve en önemlisi kendisinin ondan utanmayacağı, övüneceği bir tarihtir.

Kürt tarihi içinde tüm diğer halklarda olduğu gibi dinler tarihi oldukça önemli bir yere sahiptir. Bu dinler tarihi içinde Kürtler ilk bilinen dini inancı

olarak Zerdüştlük ayrı bir yere ve öneme sahiptir.

Zerdüş M.Ö. 660-583 yılları arasında yaşamış, batı İran'da Mükri bölgesinde doğmuştur. Bu topraklar Kürtlerin eski ataları olan Medlere ait topraklardır. Zerdüş aynı zamanda, Herodot'un, Medlerin kabilelerinden biri olarak gösterdiği Magi kabilesindendir. Zerdüştlüğün esas olarak gelişip güçlendiği dönem de Med dönemi olmuştur.

Zerdüştlük kimi literatürlerde gösterildiği gibi bir Pers kültürü değildir. O, antik Kürt kültürünün bir parçasıdır. Mag rahiplerinin her dönemde medlere olan bağlılığında bunun bir göstergesidir. Zaten Perslilerin Zerdüştlüğü kabul etmesi de sonraki dönemlerde olmuştur.

Kürtler dualizm esasında dayalı olan ve iyiliği çalışmayı, güzelliği, yaratıcılığı esas alan bu dinden oldukça etkilendiler.

Tarihin ileriki dönemlerinde de yeni dinlerle karşılaştıklarında bu inançlarından vazgeçmediler ve bu yeni dinlerle eski inançlarını kaynaştırarak yeni varyasyonlar oluşturdular.

Örneğin Hristiyanlıkla

karşılaştıklarında bu dini Zerdüştlükle birleştirip "Maniheizm" inancını oluşturdular. İslamiyet sonrası dönemde de yine bu dini Zerdüştlükle birleştirip "Yezidilik" ve "Alevilik" inancını oluşturdular. Tüm bu inançlarda dualist motifler vardır. Bugün içinde hala Kürt yaşantısında bu inancın etkilerini görmek mümkün. Özellikle ateş kültü Kürtler arasında halen mevcuttur.

Zerdüştlük Kürt kültürünün ve tarihinin önemli ve değerli bir parçasıdır. Bu inanç sistemini abartmaya gitmeden onu tarihi konumu içinde değerlendirmek ve bu tarihsel mirasımıza sahip çıkmak gerekiyor. Ondaki derin filozofik anlamı görmek gerekiyor.

Zerdüştlük ile ilgili çalışmanın ilkinde bu konuyla ilgili birde çeviri makalemiz var. Tüm insanlardan beklediğimiz odurki, bu anlamdaki katkılarını esirgemesinler ve ellerindeki her belgeyi, kitabı ve yazıyı kardeşçe birbirine ulaştırarak birbirleriyle paylaşsınlar. Bu aynı zamanda ulusal bir görevdir.

Bu makale Bürüksel Kürt Enstitüsünün 1989'da çıkan "The Kurdistan File" (Kürdistan Dosyası) adlı kitabında K.Ronahi tarafından çerilmiştir.

DİN

Tüm Kürtlerin %95'i suni müslümandır. Aynı zamanda bunlar arasında alevi bir azınlık ile 50 bin yezidi de yaşamaktadır. Son söylenilen inaç Zoroastriyan (zerdüşt) ile müslüman inançlarının bir karışımıdır.

Kürtlerin eski dini Zoroastrianizm (Zerdüştlük) idi.

Kürdistan'daki dinsel kültürel yaşam üzerine çalışmış olan papaz Thomas Bois, Amman (Ürdün) deki "Proche-Orient Chretien " adlı dergide şunu yazmaktadır: Kürtler önemli bir kesimdirler. Ancak şii İran, az veya çok laisize olmuş Türkiye ve Irak ve Suriye'nin sunni Arapları arasında islam dünyasında az bilinirler. İslamın değişik yollarının birleştiği bu noktada Kürtlerdeki dinin, büyük kısmı bilmezlikten gelinen ve onu diğer komşularındakinden ayırın bazı özel karakteristikleri vardır.

İSLEMİYETTEN ÖNCE ZERDÜŞTLÜK

Kürtlerin son ataları olan Medler, Mazdean (Zerdüşt) idiler. Ulu tanrıları "gerçek yaratıcı" veya "bilge efendi" olan Ahura Muzd idi. Bu tanrının yanında daha küçük tanrılarda vardı: Mithra, güneşin anlaşmaların kurtuluşun tanrısı ile sular ve doğuşun tanrıçası olan Anahita.

Medler tüm doğal güçlere ibadet ettiler. Büyücüler tanrılara kandan adaklar adadılar ve tapınağın tepesindeki bir odada kutsal ateşin sürekli yanmasını sağladılar. Bu büyücüler iki olgu kabul ettiler: Bunlardan biri tanrı olan "Hürmüz" (Hurmuzd) diğeri de şeytan olan "Ahriman" (Ehremen) idi.

Zerdüşt, "Zoroaster" bu mazdean dini yeniledi. 0 M.Ö. 660 yılında İran Kürdistanının ortalarında yer alan Mukri köyünde doğdu. Lirik çalışmalar olan öğütleri Zend-Avesta adlı kutsal kitapta korundu.

Zerdüşlüğün, (Zaraostrism) önemi tanrı ve şeytanda şekillenen dualizm esasında saklıdır. Bu din geniş bir alanda yeşerdi ve hatta Hindistan'a kadar yayıldı. Musevi, Hristiyan ve İslam dinlerinin her üçüde dualizm'den esilenmiştir. (1)

Zerdüş kanlı adaklar ve dini törenlerde Haoma içkisiyle zehirlenme gibi pekçok mazdean esasları reddetmiştir. Bununla beraber o, adaletin ve şeytani güçlere karşı mücadelenin sembolü olarak ateş olgusunu ortaya koymuştur. (2) Bugün bile, Kürtler hala kendi ulusal bayramları olan Newrozda (ki çoğu zaman gizlice kutlanır) ateşin çevresinde dans edip şarkı söylerler. Bununla birlikte bu kutlama dinsel bir olgu değildir. Bu insanların zulme karşı olan kavgalarını sembolize eder.

Zerdüşün esas prensibi şeytana (tüm kötülükleri temsil eden ç.n.) karşı aktif ve ebedi bir mücadeleye dayanır. Bu prensip aynı zamanda tüm insanların aydınlık ile karanlık ve tanrı ile şeytan (Hürmüz ile Ahriman) arasındaki tercih ile hayvanlar ve bitkiler dahil olmak üzere yaşamın tüm formlarına karşı tam bir saygıya dayanır. Onun ahlaki değerleri bir üçlü şeklinde özetlenebilir. "İyi düşünceler, iyi işler, iyi sözler" (3)

Roger Garaudy kendi kitabı "Appel aux Vivants" ta Zerdüş üzerine olan bölümde (Editons du sevil 1979) şöyle yazar:

"M.Ö. İkinci bin yıllık dönemin ortalarında İndo-İran göçebe kabileleri kuzeyden sürüldükten sonra soğuk

dalgaları izleyerek Sibirya bozkırlarından ayrılıp iki kola bölünmüşlerdir. İlk kol Hindu-Kuş geçitlerinden geçerek Hindistan'ın ve daha kuzeydeki Dravidyanların eski uygarlıklarıyla karışmışlardır. İkinci kol ise Afganistan ve İran platolarına yerleşti.

Diyametrik (yerleşim) olarak birbirlerine zıt yerlerde olmalarına karşı her iki kolda uzun zaman boyunca eş zamanlı olarak geliştiler. Hinduizm tüm mistiklere yol gösterirken Zerdüş, peygamberli dinlerin ilk neslini oluşturdu. Bu üç bin yıllık eski tarih hala bugünkü yaşamımızın içerisinde ve onu besliyor. Ve ilk kez insanlığın göçebelikten tarıma ve yerleşik hayvancılığa geçiş gibi yedinci ve altıncı yüzyıllar arasında olan tüm büyük devrimlerin oluşmasına da neden olan da buydu. Tarih kendi sorunlarıyla şaşırtınca peygamberlerde ubunların yanıtlarını sunmaya çalıştılar.

Tarımın doğuşu sadece ekonomik bir fenomen değildir. Aynı zamanda ahlaki ve dinsel bir olaydır. insanlık ilkez uzunca bir süreden sonra basit olarak doğanın nesnesi olmaktan çıktılar ve büyük oranda elemetlerin güçlerini kendi egemenlikleri altına almadılarsada onları işlemeye başladılar. Bununla birlikte tehlikeli güçler sadece doğadan gelmedi. Gezici göçebe kabileler tarlaları ve hayvanları yağmaladılar.

Zerdüş bir devrimci ve belkide bütün zamanların peygaberi olarak yeni keşf edilen özgürlüğü ve yağmacı kabilerlerce ortaya çıkarılan bu çifte

acıyı açıklamaya çalıştı, ona çözüm bulmaya çalıştı.

İnsanlar yaratılışın sorumlusu olarak davranmaya başlayınca Zerdüş tüm yeni yaşamın bir öncüsü olur. Çalışmaları dört basit prensip üzerinde gelişir:- Tanrının yeni bir görüntüsü (Monoteistik (tek Tanrı) ve güzelliğin kaynağı)

-Dünyanın yeni bir görüntüsü (Dünyanın insanlar ile insani yaşama karşı olan tüm güçlerle bir savaş alanı olarak kabul edildiği yeni bir görüntüsü)

-Tanrı ile yeni bir iletişim yolu (Ancak bu ayinler ve kanlı adaklarla yapılamaz. Eğer yaşamını dindarca sürdürüyorsa, o tanrı ile kendi içinde de iletişim kura bilir.)

-Doğa ile yeni bir ilişki (hem hayvanlardan, hemde bitkilerden oluşan yaşama saygı göstermek)

Garaudy şunları da ekliyor: "Zerdüş'te göre yaşam, içsel olarak içimizdeki kötü uyartıları ve dışsal olarakta kötü işleri yapanlara karşı olan bölünmez bir mücadeledir. Bu doktorin geçmişin ruhanilik (içsellik) ve geçerliliğinin tüm boyutlarına hareket getirmiştir. Her insan aynı zamanda hem bir savaşçı hemde bir mistiktir."

Daha sonra M.Ö. 224 yılından sonra Zerdüşlük, M.S. 642 yılına, islam fetihlerine kadar Perslilerin resmi dini olarak kalmıştır.

İSLAMİYET DÖNEMİ

İslam imparatorluğu altında ve değişik bölgelerde kürt kişiliği daha sonrdaki pekçok ünlü bilginin yetişeceği çeşitli teknik okul ve camiler

oluşturdu.

Papaz Thomas Bois "Prohe Orient Chrétien" adlı dergide şunları söyler: "Sonradan ismini terk eden ve çalışmaları saygıya değer olan ilahiyatçı, hukuk adamı, tarihçi ve bilimadamları vardır ve bunların katalogunda kanıt olarak gösterilebilir. Ünlü kahire Üniversitesi (El-Azhar) profesörlere ait bu tür kataloguna Kürtleride dahil etmiştir."

Gözlemcilerin tümü kürtlerin özellikle dindar olamadıkları konusunda hem fikirdirler. Bir Türk atasözünde şöyle der: "Bir Kürt bir kafirle karşılaştırıldığında sadece bir müslümandır."

DİPNOTLAR:

1-) Paul du Brevil, zarathustra et la transfiguration du monde, payot, 1978

2-) Duchesne -Guillein, Religions de l'orient Ancien, Collection je sais, je crois n 141, 1957, p.103

3-) Ghisman, R.L'Iran des origines L'islam, Payot 1951, P.142.

ROJEKİ

Hêviyên me
Wê rojekî bîbîn gulên sor
Û li barxên welatê me vebîn
Zanîbî tu yarê
Yara mîn a delal
Wê gavê ezê bigirîm bî,
Destê tê yê narin
Û bî dîşadîya me
Emê têkevî wê dilanê
Û dî wê demê da,
Kenê te
Wê mîzgîniya Azadî be
Jî dilê mîn ra
Salehê Hesên

Ji NAV EDEBİYATA CIHANÊ

ŞERVANEK AZADIYÊ, DILDAREK AŞITIYÊ, MIROVEK GERNAS Û DILPOLA:

Pablo NERUDA

Jiyan MINARÎ

"Gelîm ez,
bî tîlikan nayê m jîmartî,
dîdengê mînda
hêzek zelal heye,
ez dî tariyande bejndîdîm,
bêdengiyê dîçîrînim.
Mîrî, gernas, cemed û sî
her çî he be
jî nûve lî benda
tovê xwe ne,
û gel dîbîn axêda veşartî,
her wek genîm şîndîbe,
û derdîkeve ser erdê
bî wan destê sor û delal
ku wek badekan
bê dengiyân dîçîrîne
Em gelîn
jî nu ve ajdîdî dî mîrînan de..."



ser heqiyê. Neruda dî sedsala 20 tan de navek jî wan navên here grîngê cihanê ye. Dî warê edebiyatê de, nemaze, dî helbestvanîyêda dengêk navdar e.

Sedem vê yekê sala 1953 xelata Aşitiyê, ya Lenin û sala 1973'yan de jî xelata Nobelê ya edebiyatê wergirtiye. Bavê wî kargerek riya hesin bû. Jî binemalek feqîr bû Neruda. Diya wî dema ku wî anî dîne, emrê xwe jî da Neruda û ew bixwe mîr. Babê Neruda pîştî ku jîna xwe windakîr çû Temuco. Nerûda kurek piçûk, lê hîşyar bû. xwendîna sereke lî wîr kurtakîr. Neruda dema dehsalî bû dest bî nivîsandîna helbestan kîr. Sala 1920 navê xwe dani Neruda (Pablo Neruda) Sala 1921 an çû paytextê Şîlî Şantîyago. Cara ewî dî sala 1923 de helbestên wî hatî bîhistî û nav dan. Sala 1925 pirtûka wî ya

Neruda pîr jî Şîlî hezdîkîr. Ew him helbestvanek aşîti xwaz û giranbîha bû, him jî mirovek welatparêz bu ku her tîm dilê wî bî azadiya welêt va bû. Çendî sal êza dî, koçkîrî û heps û zîndan û îşkence wî jî riya wî neda paş. Ew bî xwe nîviskar bû, lê dilê wî lî çîya û lî êniya şoreşê dîgeriya. Neruda, dengêk bîlînd bû lî parzemîna Emrîka. Hemû gelê bîndest bî dengê wî şa dîbûyan û hêz dîstandî bî awaza wî...

Navê wî yê eslî NEFTALÎ RI-CAORDO REYES BASATO ye. 12 yê tîrmeha sala 1904 lî Parral hatiye dîne, 23 yê Îlona sala 1973 lî Santiago çûye

yekem çap bû. "Cehda mîrovê Bêbin"
Neruda bî hemî cihne da nasin.

Sala 1927 bû sefirê dewletê. Lî Ran-
goon lî Seylan û Cakarta û Colombo û
Singapûr pênc salan Sefîrtî kîr. Dema
ku lî Cava sefir bû, bî keçîka xweşik ya
Holandi Marina re zewêci. Dî sala
1933'yan de Şairê mezîn Garcia Lorca
re hevnas bû. Paşê lî Madrid, piştê wi jî
lî Berselona bû sefir. Neruda zewaca
xweya dudiya lî Berselona kîr û bî
Delia re zewîci.

Sala 1936 lî Îspanya şerê hundur
dest pê kîr. Hevalê wi yê hêja Lorca
hat kuştin. Narûda lî ser wan bûyeran
zêdetîr politize bû û xwe da ser xebata
siyasi. Dî sala 1937 de pirtûkek wi jî
aliyê partizanan ve lî çiyê hat çapkirin.

Sala 1943 vegeriya Şîli. Pîştî du
salan dî helbijartîne de bû senator û
kete meclîsê. Lê hukumeta Şîli ber bî
kevneperestîyê ve dîmeşîya. Neruda jî
bî wî rewşê qail nebû. Hemû pêşverû û
koministê Şîli, jî neçari xwe veşartin û
kîşiyane bîn erdê. Neruda jî xwe veşart.
Êdî dengê Nerûda wê jî bîn erdê bîlind
bî bûya. Ew salên veşarti bû, salên here
hêja bûn. Lewra Nerûda dî van salande
gelek berhemên hêja efîrandîye. Dî
sala 1948 ande, lî çiyayê andê bî hespê
derbas bû û çû dervayê Şîli. Lî Parisê,
dî kongra aşîtxwaza de beşdar bû. Sala
1949 çû Meksîka. Dema ku tedahiya lî
ser çapger û kominista sist bû, sala
1952 disa vegeriya Şîli.

Sala 1969, jî aliye partiya kominista
Şîli ve bû namzetê serok komartîyê. Lê
Neruda wî ciyê xwe da Salvador
ALENDE. Sala 1971 bû sefirê Şîli lî
Paris. Sala 1973'yan mala wî dagirtin,
kitêbên wî wêran kîrin û wî binçev
girtin. Nerûda dî vê demê da jiyana
xwe kuta kîr. Lê xebata wî hê jî dajo.

Neruda, iro lî hemû ciye cihanê bî
kêf tê xwendîne, lewra ew Bangewazek
netîrs bû. Jî aliye ve bî nîvisana hel-
bestan xîzmata şoreş û rîzgariyê dîkîr,
jî aliye dîn ve dînav tekoşîn û siyasetê
de bû, tekoşer û şervanek aza bû.

Helbestên wî dî destpêkê da, pîrani
lî ser ewîntî xweza (tabiat) û gernasîyê
hatîne nîvisandin. Ango dî jiyana hel-
bestvaniya neruda de du qonexê grîng
hene. Qonaxa yekem, destpêk e, hê bî
siyasetê hevnas nîne û ne aşî e. Qona-
xa duwem, êdî rêyek nû girtiye. Hel-
bestan wekî gulleyên çeka dîbarîne û
helbestê wî dî şoreşê de mesajê bî kelk
în (fayo dane). Helbest gerîya şoreşgerî
û gelperwerî ya Neruda dî qonaxa
dîduyan de dest pe dîke. "Sitrana
genim" berhemek vê demê ye. Dema ku
lî çiyê partizani jî dîkîr, tu carî dev jî
helbestan bernedîda. Hevalên wî yên
nû çêbûn lî çiya. Şerger û partizan
gelek jî wî hez dîkîrin. Wekî Rudo,
Rosa, Leone, Dorlize, Dorelle, Abigali û
yê dîn. Jî wana zêdetîr, Rudo lî ser wî
tesîr kîrîbu. Lî ser evîna Rudo û Rosî
wîha dî got:

*"Rudo, serdarê kevîran
bê temaşekîrîn wê dît.
ew bu, ew Rosa bu,
ew keça cotkar, keça sezar
memikên wê gîran û delal bun
dev û cavên wê pîçûk
dema dîçû şer avê
wekî cera avê bu....."*

Dî helbestek dîn da jî behsa mîrîna
Rudo dîke û wîha dîbêje:

*"Mîrîna şevê wî pêça
wekî ku
şîna wî
rûyê erdê dadîgîrta,
paşî xwe*

*bî ser dîteriya va ber da
 û ber bî kuraniyên nenas ve meşiya"*
 lî ser çalaki û xebata sergereki ji Ne-
 ruda bî kurti biraninên xwe wîha go-
 tiye:

*"Jî bo damezrandina serdariyek çê
 li axek nu geriyan û
 li axek şin geriyan
 Jî bo ku ala xwe
 tê da bîşon
 Jî qirêji yê..."*

Her wîha lî ser Şili ji dî helbestek
 xwe da Neruda:

*"Rojgeran dîşkê
 li wî ciyê ku Şili dî qede
 zanyariya tafanan
 derya û agir e,
 erd hejanên çiya
 û kêşanabayê
 moranên dijwar û tujiya wan
 avê û axê par dîkîn..."*

Bî rasti ji Pablo Neruda welatperwe-
 rek dîlîrin bû. Ew dî xebata serketin û
 rîzgariya gel da xwe weki neferek eniya
 şer hesab dîkir. Navdengi ya xwe dî
 nav welatên dereki da xistî ku gaziya,
 rewşa Şiliyê. Bê westan dî hemi jiyana
 xwe da xebitî û bî rûyek sîpî û
 şerefmendi axirin nefesa xwe da.

Çend pirtûken wi yê here gring
 evin:

Gel û Hêvi (1945)

Tîrî û Ba (1954)

Şûrê jî Agir (1970)

Bangevaziye Ruxandina Nixon û
 Peonê Şoreşa Şili (1973)

Gelek pirtûkên helbestvanê hêja lî
 dinyayê belav bûne. Her wîha lî
 Türkiye ji çend pirtûkên Neruda
 hatine çapkirin. Hêvidarî ku, gelê
 kurd jî vê awaza xweş rasbîke û hel-
 bestê Neruda wergerîn zîmanê kurdi ji.

JÎ NAV KILASIKAN

KEW Ê WETAN

Wexta eburê bu. Încî kewê ra
 gotin: "Mere, kozîk û mîterîs ber te
 çêkirine Ewê te bîkujin."

Lê kewê jî wan ra veğerand;

"Fenne lî min fen ne

Pêşiya min ta û ben ne

Bî sed qerarê xedê

Serîk e ezê bîdîm ser wetan e"

SİLÊMANÊ SILIVÎ

Silêmanê silivî merivekî pîr
 dewlemend bû. Xweyê pez û de-
 wara bu. Famîla wî famîlekî fireh
 bû. Ew sal lî çiya, dî kon da bûn. Lê
 ew sal jî berf û baran bêhisavkirin
 bari. Berf bîvû minî kîdîsan.
 Konê wî jî dî berfê da rîtîmî bû.
 Hemû kulfetê wî û pez û dewarê
 wî tevihev mîrîbûn.

Serê sîvê rabû. Darê xwe da
 millê xwe, û bî qirê qir, zûre zûr jî
 jor da dîhat û dîgot.

"Sevatoka silivani

Civîka virvirani

Min konê xwe lî çiya dani

Te wardiya kulfet lî me ani."

K.RONAHÎ

EKREM CEMİL PAŞA

JÎNA MIN BÎ KURTI

Nasandin

Ekrem Cemil Paşa biraninên xwe, Jina min bî kurti, bî tirkî "Muhtsar Hayatım" di 1973 de, di 82 saliya xwe de, berê mîrîna xwe bî salekê nivîsin.

Giringbûna vepirtûke dîroki ye, ji bo ku em tê de bûyerên giring ku heta nuha hema ne hatine zanîn û rola mezin ku ronakbîrên kurd ên destpêka vê sedsalê di şiyarbûna hestê neteweyî li ba gelê kurd de lîstî hin dibî.

Di vê kurteyê de, nîvîskar bixwe, weka di pirtûkê de, dipeyve :

Kurte

JÎNA MIN LI STEMBOLE Î ŞIYARBÛNA HESTÊ NETEWEYÎ

Ez ji Diyarbekirê me. Heta 21 saliya xwe, ez li sarayê bapirê xwe, Cemil Paşa, dijiyam. Yazdeh zarokên wî, tevi malbat û şagirtên xwe, di vê koşka mezin de diman. Wî jî du kurên xwe re berpirsîyarîyên giring da bûn : Fuad Beg (bavê pîsmamê min Qedri) bî karên hundirî, malîye û karên derve û Qasım Beg (bavê min) bî dadmendi (edalet) û bergirîya (xweparastin) malbatê xerik (mîjûl) dibûn. Gava ku Cemil Paşa di 1902 de wefat kir, ez 11 salî bûm. Piştî demeke kurt ez hatim şandim bo Stembolê jî bo xwendina lîsê.

Di 1908 de, di destpêka sala xwendinê de, hemî dibistanên Stem-

bolê dîkelîyan. Jî fêran bêtir, meriv sloganên "Bijî Azadî, Dadmendi, Wekhevi" dibihîstî. Lê van sloganên dilê me, zarokên kurd, têr ne dikir. Zarokên tirk ên ne tirk : Kurd, Arnaût, Ermeni, Çerkez... dipelîxandî yan dixwest bîpelîxinî.... Her roj nexweşî û sarbûn di navbera Kurd û tirkî de bêtir dibûn. Şevêkê, şerrekî cîddî di nav van her du koman de çêbû. Jî wê gavê, kurdî di dilê min, ê apê min Omer û pîsmamê min Qedri de şiyar bû.

Ev kurdîtiya ku bî şerrekî zarokan dest pê kir, meyweyên xwe bî awakî cîddî piştî çar salan dan. Di 1912 de, me komela xwendekarên kurd, Hêvî, li Stembolê ava kir. Piştî avakirina wê ya fermî, nêzîkî 200 xwendekar xwe tê de qeyd kir. Ev komel kovarên hefteyî weka Rojî Kurd û Hetawî Kurd diweşandî.

EWROPA Î LEŞKERÎ

Kurên Cemil Paşa ku çûn Ewropayê jî bo xwendinê şaxên Hêvî li Cenev, Lozan û Munîxê vekirî. Hevalan ez sermîyanê (serok) şaxa Lozanê tayîn kirim. Piştî xwendina hendesê li Lozanê bî salekê, ez çûm Gan, li Beljîkayê.

Mixabî, wê salê tu bextê xortên kurd tu ne bû. Şerrê cihanê di 1914 de dest pê kir. Xwendekarên osmanî ku li Ewropayê bûn diwiyan biçûn Stembolê. Şerrê Çanakkalê dest pê kir. Tabûra

mın, pişti demeke kurt, hat şandin bo eniya Erziromê, ku jê re eniya Qefqasyê dihat gotin. Sê apên mın tê de jina xwe hunda kır û di çola Bexdayê de birayê mın ê piçûk hat kuştin.

Dî zıvîstana 1917 de, Mustafa Kemal (Ata Türk) hat terfî kîrîn û jî Diyarbekirê hat şandin bo Şamê. Dî ciyê wî de Nihat Paşa hat danîn. Wê gavê, tabûra mın lî eniya Fîlîştînê, di bin bombebaranê dojehî (cehennemî) ya Ingilîzan de, têk bû û ez vegeriyam Diyarbekirê.

JÎNA MIN LÎ DÎYARBEKÎRÊ

Piştî gihajtina mın bî demeke kurt Peymana Mondorosê hat imza kîrîn. Leşkerên ewropî yê hevalbend, Ingilîzan di serî de, Stembol, navçeya Yûnani, beşeke mezî jî Anadoluyê û, lî kurdistanê, Maraş, Urfa û Entabê vegirtin. Mın û du hevalên xwe, piştî got û bêjên çend rojan û guhdarîkirina şîretên bavê mın, bîyar stend ku em jî bo gelê kurd xebat bikin.

Bavê mın yek jî xaniyên ku dida kîrê da me. Bî vî awayî, me nêzîkî du mehan niv-dîzî kar kîr. Piştî civîneke dirêj, me bîyar stend ku em civîneke vekirî lî Tekkeya Gul Şenî çêkin.

Mın pêwendî bî Wali re kîr. Gelek kes derketin sahnê û ilan kîr ku Stembol jî aliyê bîyanîyan hatiye vegirtin û ku dewleta Osmani têk dibe. Wan bangî hemî Kurdan kr ku yek bîbîn û ku eger nebîn ewê Kurdistan bibe weka Ermenistanê. Lî hundirê mîzgeftê jî 400 kes bêtir hebûn. Çarîkê vê girseyê (kitle) jî eşraf û karbidestên bîlind ava bû bû. Ên mayînan cuhanên ronakbîr û kesên besit bûn. Hewş û

kuçeyên nêzîk bî welatparêzên kurd tije bû bûn.

Piştî du saetan, dî mîzgeftê de bîtenê çîl kes mabûn. Wan vê bîyara kurt stend: avakîrîna rêxistinê siyasî ku navenda wê Diyarbekir be, xwestina destûra fermî (resmî) ya Wali û desthilatên (otorîte) pêwîst, nivîsina destûrê. Navê rêxistinê bû Komela Kurdistan. Komîta idarîyê jî çar kesan ava bû. Ez sermîyan (serok) hatim bîjartin. Ez sermîyanê yekemîn ê fermî yê rêxistinê siyasî ya kurdi bûm. Dî demeke kurt de, bî hezaran Kurd jî çînen cîvaki yê cihê, xwe tê de qeyd kîr. Şaxên wê lî Nuseybin, Savur, Farqîn û Lîcê vebûn. Dî navçeyên din de, gelek sempatîzanên me çebûn. Me pêwendiyên muntazam bî Komela Kurdistan ku piştî heşt yan neh mehan lî Stembolê vebû kîrîn. Em bûn xwediyên çapxanêke piçûk, a yekemîn lî Kurdistanê. Bî saya wê me rojnameke çar rûpelan, Gazi, çap kîr.

Piştî demekê, gelek kesên pîr hatin ba me. Emhen cuhan, me şerm dîkîr ku em sermîyanên wan bin. Me bavê mın, Qasım, kîr sermîya hu ez bûm alîkarê wî. Çar salên şerr Kurdistanê têk da bû. Dî 1917-1918 de, birçibûn û nexweşî Kurdistanê talan kîr. Ittihadciyên şoven û fanatîk lî herderî hukim kîr. Nemaze dema ku dawîy şerr nêzîk bû, gava ku zagona (qanûn) sîrgûnkîrînê (îskani muhacir) hat ilan kîrîn, bela lî ser Kurdistanê, bî qasî lî ser Ermenistanê ket. Lî gel ku Stembol ketî bû nav desthen Hevalbendan hu ku Imperatoriya Osmani têk bû bû. kurdan vê yekê bawer ne dîkîr. Ew hin jî jî hikûmeta

tırki dıtırşıyan. Loma, komela me bî hemî hêza xwe jî Kurdên ku jî 400 sal de dî bîn stema tırki de dînalıyan dıgot ku ev dem qelsbûn û hilweşana imperatoriye ferzenda xelasbûnê bû.

Dî vi kari de serfirazbûn tîşteki gelek zor bû. 90 % Kurdan nexwenda bûn û piraniya berpirsiyarên olî (dînî) hevalbendên hikûmeta tırki bûn. Dî bîhara 1919 de, Mustafa kemal bî dîzi, weka mufettişê leşkerî, çû Erziromê. Lî wê derê û lî Sivasê kongreyan pêk anin û tê de, bî avakî fermî, bê westabûn dúbare dıkr ku Tırk û Kurd bîra ne û ku kurd ewê mafên xwe yê siyasi bîstin. Wî cillên olî lî xwe dıkr ku şexan bıkışîne xwe.

Jî bo ku karîna (îktidar) xwe lî Diyarbekirê xurt bîke. Mustafa Kemal sê Paşayên dîn şandin wê derê. Em çend caran rasti wan hatin. Cıvîna gırıngtırın bî navê Cıvîna Belediyê navdar bû. Hemî rûniştewanên Diyarbekirê hati bûn wexendin (dawet kırın). Xelk tê de bî qasî cıvîna Gul Şenî ya berê sal û nîvekê beşdar bû. Jî derveyî me, du komên beşdar, ên nêzîkî paşayan, hebûn: Hürriyetci û İttihadci. Kenan paşa dest bî peyvê kır. Wî bî awakî vekırî êrişî me ne kır, hemî rûniştewanên Diyarbekirê vexwendin yekitiyê, bê rawestan sloganên bîratîya olî, bîratîye Tırki-Kurdi avêtin û her sê komên ku beşdari vê cıvînê bûn vexwendin yekitiyê.

Mîn bî xurtî bersıva Kenan Beg da, êrişî İttihadciyan kır û nemaze siyasete wan a sirgûnkırîne ku mîn navê wê kır "nıjadkuji" teşhîr kır. İttihadci bê hêvî jî avahiyê derketin. Vê cıvînê ser-

ketına me nişan da, lê em têgihajtin ku ewê Mustafa Kemal zû bî zû jî me bernede. Merivên wî bî zexeyî (hîle) endamên me ne çar kırın ku istifaya bıkın. Rojnameya me nema derket. Hebûna şerî ya rêxistina me bî tehlike bû bû. Pıştî gotûbêjên dirêj, me bîryar stend ku ez dıviyam istifaya bıkım û Diyarbekirê berdım. Weka ku hun dıbîn gelê kurd ê nezan bî destê xwe hukmê idama xwe imza dıkr!

Mîn roja dîn Diyarbekirê berda. Ez dıviyam jî rîya Helebê bıçım Stembolê. Jî wê derê, ezê bıçûma Beljikayê jî bo ku xwendına xwe bıqedinım. Lî Helebê, ez rasti delegasyoneke ku jî Kurdan û İngilizeki ava bû bû hatım. kurd her du bîra. Celadet û Kamuran Bedır Xan, bûn û yê İngilîz Major Noel bû. Bî destûra Sultan Vahdettin, ewê jımara Kurdan û Ermenîyan tesbît bıkırana. Wan gelek dılîniya (ısrar) kır ku ez bî wan re bıçım. Pıştî bireke 24 saetan, mîn bîryar stend ku ez têkoşînê dewam bıçım û vegerım Beljikayê.

Dî rê de, me çend rojan lî Malatıyayê derbas kırın. Şeva çaremin, nêzîkî sıbê, hevaleki telgrafci bî dîzi lî deriyê mîn xıst û jî mîn re got ku Mustafa Kemal ferman da bû serbazên (esker) xwe ku jî Elazizê êrişî me bıçın. Em dıviyan bajêr tavil berdın. Me dî rê sıwarên tırk dıtin. Ew, dî deşteke fireh de, jî hespên xwe peya dıbûn. Wê gavê, em jî rıyeke kaş peya dıbûn me rîya xwe guhert û ew dî rewşa "ağır berde" vezeliyayî dıtin. Dî quncika rê de, me bî du serbaz û komandanekî wan gırt. Pıştî ku me çekê wî stend, me jî komandan re ferman da ku jî zılamên

xwe re bêje ku vegerin Malatyayê û soz da wi ku gava ku dûr bikevin emê wi û du serbazên wi berdin. Jî tirsan, wi bi gotina me kîr û serbazên tirk dûr ketin.

Lî ser riya Urfayê, em bûn mêvanên mudirê nahiyê. Wi telegrafeke ku jî aliyê Mustafa Kemal hatî bû imza kîrîn nişani me da : Wi tê de ferman dîda serbazan, sivilan, hemî karbidestên ku li me bigerin. Mudirê nahiyê alîkariya me kîr ku em bi keştiyan Fîratê derbas bin. Pîştî derbaskirina şevê li Urfayê, em çûn Heleb, mersin û Paşê Stembolê.

Pîştî ku me çend rojan bîna xwe stend, ez diçûm serdana hevalên xwe yên ku rojnama Jin, organa Komela Kurdistan li Stembolê, diweşand. Sermiyanê amerîkî Wilson prensîpên xwe yên mafê çarenûsî yê gelan îlan kîrîn. Ewropîyan serxwebûna Kurdistanê dixwest. Me xebat kîr ku Şerîf Paşa yê Silêmanîyê bi nîminendeyê Ermenîyan, Bogos Nubar, re li hev bê û ku kurdan li Peymana Sêvr a 1920 temsîl bike. Ew şahî gelek dewam ne kîr. Mustafa Kemal hertiştî kîr ku tatbîqkirina Peymana Sêvrê ne hêlê. Wi telegrafan dişandîn herderî û tê de diçûn ku têkoşîna neteweyî yek e, ku ew ya birayên kurd û tirk e, ku Kurd ewê mafên xwe bistînin. Komela me biryar stend ku min bişîne Kurdistanê jî bo şîyarkirina Kurdan û rawestandina planên Mustafa Kemal.

Dî Tebaxa 1920 de, min keştiyeke (gemi) itali jî bo Antalyayê stend. Jî bêbextiya min, Itali wê gavê Antalyayê jî Mustafa Kemal re vegerandî bûn. Ez

ketim feqê. Ez bi keştiyeke piçûk ku dewar diçûstîn vegeriyam Stembolê. Ez neçar bûm ku her du mehên zivistanê li Stembolê derbas bikim. Dî sibata 1921 de, ez diçûm ku pasapor-teke din bistînim û riya Iraqê bigirim. Dî 50 rojan de ez çûm Stembol, Pirê, Iskenderîye, Qahîre (li wê derê ez 20 rojan mam, jî bo ku keştiyeke vala tu ne bû), Por Seid, Eden, Karaçi, Basra, Bexda, Mûsilê. Jî Mûsilê heta gundên me yên Diyarbekirê, ez 17 rojan peyati çûm.

Pîştî demeke kurt, tirk hatina min hin bûn. Şevê, polis û leşker dora taxa me girt û mala me teftîş kîr, lê ez tê de ne ditim. Jî pênc mehan bêdîr, ez bi zîlamên çekdar û hin jî hevalan re li navçeyên hewsê (ciran) diçûm: Hemi şîretên min, hemî propaganda min jî guheki diçûn û jî yê din derdîketin! Jî bo ku Nihat Paşa bi kîşandina Muftî, Şêx û Mellan xelk baş bijehr kirî bû.

Jî sedema neserketina xebata min, me biryar stend ku ez vegerim Stembolê. Hevalan ez birim heta kêleka Dîclê, gundê Çêlikê Eliyê Remo ku axayê wi Abdulkerim bû. Vi zîlamî soz da bû bavê min ku alîkariya min bike jî bo ku ez derbasi Mûsilê bibim. Lê vi merivê ku bavê min jî girtigehê û jî hukmê idamê kutah (xelas) kirî bû. Xîyaneta me kîr û ez teslimî Tirkan kirim.

Roja din destên min zîncirkirî, ez li ser qantirê hatim sîwar kîrîn. Serbazan dora min girt. Abdulkerim bixwe tevî 300 zîlamên çekdar ên jî êla tesîr wi ez li ser hesp birim heta Diyarbekirê.

Ez jî Midyad, Mêrdîn, Diyarbekir (lî wê derê ez 17 rojan di girtigeheke binerdi de mam) Maden, Elaziz, Meletî, Sêwaz, Qeyserî, Kabîrşehrê, lî ser qantîrê, destê min gîredayî, di serma û berfê de, derbas bûm. Pîştî 45 rojan ez gihajîm Enqerê. Min zivîstana 1922 di nav nêzîkî 1.500 girtiyên siyasi de, di avahîyeke jî kevîr de, derbas kir.

Da'wa min jî çar mehan bêtir, lî dadgeha Istîqlal, lî Enqerê, ajot. Bî saya mudahelên cihê, bîryar hat stendin ku ez bêsiûc derkevim, lê ku ez bî awakî katî (muweqqet) lî Enqerê bîminim. Pîştî sê mehn, ez vegeyîyam Diyarbekirê, tevî mufettişekî amerîkî ku bî sêwixaneke ermenî xerîk dibû.

Min salên 1922-25 lî gundên bavê xwe derbas kirin. Ez tê de bî çandîn û nêçîrê xerîk dibûm. Di 1923 de, Peymana Lozan a Sêvrê têk da (xera kir). Kurdan nîkari bûn tu mafî bistînin. Îngîltere Kurd jî Mustafa Kemal û Qral Faysal ê Bexdayê re firoti bûn. Di 13 Sibat 1925 de, gava ku lî Piranê tîfîngên pêşîn ên serhîldana mezîna Şêx Seîd teqîyan, polis û leşker dora mala me girt. Ez nexweş bûm, haya min jî tûtiştî tu ne bû, min ne zani bû jî min re çî dibû. Pîştî min, wan du ap û çar pîsmamên min girtin. Pîştî girtîna min bî 24 saetan şerrê Diyarbekirê dest pê kir.

Sermîyanê mezîna Şêx Seîd û 150 jî zîlamên wî lî Diyarbekirê hatin mahkeme kirin. Dawa me ya hevreyî nêzîkî meh û nîvek ajot. Şêx seîd û 51 jî qehremanên wî hatin bî dar vekirin. Hin jî hevalên me hatin berdan. Min bixwe 10 sal ceza, lî girtîgeha Kastamonu,

stendin. Pîştî sê sal û niv, ez hatim berdan. Ez sê mehan lî Kastamonu, pîştî şeş mehan lî Stembolê hatim sîrgûn kirin. Diya min lî wê derê felc bû bû û bavê min mirî bû.

Pîştî 1926, stema (zulm) Mustafa Kemal lî Kurdistanê belav bû. Di pêşîyê de, wî malbatên mezîna ên bajari, pîştî sermîyanên êlan û di dawîyê de malbatên gîrîng sîrgûn kirin Anadoluyê. Nêzîkî 50.000 girtî ber bî girtîgehên din ên dereyî Kurdistanê hatin birin. malbata pêşîn ku hat sîrgûn kirin a me bû. Hemî endamên wê lî herderê Anadoluyê hatin belav kirin.

JÎNA MIN LÎ SÛRÎYÊ

Di 20 Sibat 1929 de, destûr jî mir re hat dayin ku ez vegeyîm Diyarbekirê. Lî wê derê, rewş ewqas xemgîn bû ku em tîgihajîm ku me nema dîkari bû em bî Tirkên re bîjin. Tevî sê pîsmamên xwe, Qedri, Muhammed û Bedri, ez pena bûm (iltîca kir) Helebê, lî Sûriyê. Bîrayê min ê piçûk, Miqdad, paşê xwe gihand me. Memdûh Selîm ku berê me, di 1927 de, hati bû, lî Suriyê rêxistîna Hoybûn "Serxwebûn" ava kirî bû. Ez û Qedrim xwe gihand wî. Vê rêxistîna jî serhîldana Agirî re, di 1930 de, alîkari şand, pêwendîyên xwe yê muntazam bî Kurdên Tirkîyê û Iraqê re kirin. ko-vara Hawar weşand,

Jî 1934 heta 1939, pîsmamê min Qedri bû nîminendeyê siyasi yê Hoybûnê. Jî destpêka şerrê cihanê yê duyemîn heta 1946, ev erkê (wezîfe) hessas jî min re hat dayin. Ez diçûm ba hemî sefaretxaneyan, lî Şam û Beyrûtê, jî bo xwestîna alîkariya dew-

letên cihê. Dema ku di 1946 de Komara Kurdi ya Mahabadê hat ava kîrîn, weka hemi rêxistînên kurdi yên din, Hoybûn ji nîminendeyê xwe Qedri şand wê derê.

MAMOSTETIYA MIN

Cara yekemin, di 1915 de, li Sêwazê (Sivas), li eniya Qefasyê, min mamosteti kîr. Xwendekar bê mamoste ma bûn, ji bo ku ew çû bûn şerr. Min sê mehan, bê pere, şaxên zanyari (ilmî) fêri wan kîrîn.

Cara duyemin, li girtigeha kastamonu, ji Îlon 1925 heta Gulan 1928, bû. Min Qur'an, tîrki û fransi hin dîkîrîn. Ej ji farîsi ji hevalê xwe Hemze hin bûm.

Cara sîyemin li gundê me Talik bû. Min li wê derê zîmanê kurdi ji zarokên gund re hin dîkîr.

Cara çaremin ji li gundê Talik bû. Min şaxên zanyari ji her sê keçên xwe re hin dîkîrîn. Pîştî mîrîna trajîk a keça min a mezin, di 1953 de, em pênc salan li ser hev li wê derê man.

Cara pêncemin, qet nayê bîra min li ku, ne ji ji ki re!

JÎNA MIN LI GUNDÊ TALIKÊ

Di 1929 de, piştî Helebê, em li Cezîrê, li Hesiçê bi ci bûn. Me erdê Talikê ku nêzîkî nahîya derbasîyê bû kîrî. Li dora vi gundi, bi sedan kilometre çol hebû. Îro, tê de ji 1.500 gund bêtîr heye. Nêzîkî 2.000 traktor tê de erd cot dîkîn. Ev bi saya serhîşkiya min û çend perçeyên zêr ku bavê min hîştî bûn bû.

Dema ku em li wê derê bi ci bûn, endîşeya me ya pêşîn pîrsa saxiyê bû, ji bo ku di vê çolê de tutîştînin bû. Bi

saya şîretên hevaleki bijîjk (doktor), min li Helebê hemi dermanên ku ji bo nexweşiyên sıvîk pêwîst bûn kîrîn. Hemi nexweşên gundên hawsê bê pere dihatîn ba min.

Di 1943 de, min bir kîr ku ez bexçeke meywan (fêki) li Talikê biçînim. Hêdi hêdi, jîmara darên meyweyên cihê gihajî 1.400 û yên mêw heta 500. Ev bexça ku min bi ewqas evîn ji 1943 heta 1967, angî 24 sal, xwedî kîr, ji destê me hat stendin. Em iro li Şamê, stû xwar, li sirgûnê ne. ■

Bultena sêmehi ya agahdariyê
No 2- Adar 1990

Weşana Enstituya Kurdi Ye
Brükselê

Rupel: 3-8

*Biz doğarken ölümü başucumuzda
görmüşüz*

*Yalnız bırakılmış, ezilmiş, horlanmış
Yerinde vurmuş, yerinde vurulmuşuz
Öyle olmuşuzki ölüm duyduğumuzu
yitirmişiz*

almalıdır. Ama Koma Berxwedan, Koma Dengê Azadi' den her hangi bir arkadaş her hangi bir siyasi gruba sempati duyabilir bu çok doğal olan bir şeydir. Bu ressamın içinde geçerlidir, A ressamı ya da A grubunun ressamı olamaz. Kürt halkının -eğer ressamı o halkın tümünün ressamıdır. Hatta ben zaman zaman bir korucunun bile onun ürünü alıp duvarına asabileceğine inanıyorum. Çünkü Kürt kili mi hem korucunun evinde var hemde köministin evinde var. İkisi de üstünde oturuyor. Bu ikisinin de değeridir. Biri o yarattığı o değere ihanet eder biride korumaya çalışıyor. O zaman sanatkarları da böyle gruplara bölmemeli diye düşünüyoruz, tepkiselde yaklaşmamalı. Sanatçı özgür olmalıdır.

NIŞTIMANA ME

FARQİN


S.KORKMAZ

Welatê Xwe Nasbîke û Jêre Xwedi Derkeve

Geli xwendewara, emê jî vê hejmarê bî şûnde dî nav rûpelê Govendê da niştimana xwe bîdîn naskirîn. Ew welatê ko em efrandine û jî mera dayik-tî kiryê û ewê jî me bî şûnda lî zaroyên me jî wariti bîke dîvê em ewî baş nasbîkî û jêre xwedi derkevî wî gund û bajar, dest û çîya mêng û geli, dêr û mîzgeft, kele û bîrc, çem û kani, rewşa aborî û xwezayî ya welatê xwe dî kovara xweda bîxwîn û hinbîkî.

Bî vê armancê emê dî vê hejmarê da behsa Farqînê bîkî. Lewra ko iro bala her kesî lî ser Farqînê ye. Farqîna rengî iro reş grêdayî ye. Şîndare Farqîn. Ewrê reş û tari lî ser Farqînê dî gerî û esmanê şîn tari dîkî. "Şîna Farqînê!" bî serê xwe babeta nîvisarekî ye, lê ew bîra mîmine wextekî dî.

Berî ko em Farqînê bînîsîn, dîxwazîm çend gotîna lî ser wate û karmendîya welatparêzîyê bêjîm. Jî ber ko ev bêje bûye benîştê deva û gellek popûler e. Tu, jî kê dî pîrsî dîbê, ez welatparêzîm! Welatparêz û welatfiroş lî nava hev ketîne. Gelo têgihîştîna welatparêzîyê çîma wîlo erzan e. Dîbê welatparêzî têgehek ko lî her alî bê



Pîr a Malabadê

kîşandî û kî, çewa bîxwaze wîsa wate bîke nîbe.


Lî ba dîle mîn, wata welatparêzîyê yeke û ewjî hezkîrîna hemgeli ya herî mezî e. Hezkîrîna welat û berhemên netewî lî pey hezkîrîna mîrovatî tîn. Jî ber ko jî insan bî rûmettîr tu tîşt nîne û hemû tîşt jî bo insan e. Welat jî bo insan, Dewlet jî bo mîrov e. Lê berî ko tîşt jî bo mîrov bîn, dîbê pêşî mîrov jî bo xwe û jî bona hev bîn. Yê jîyanê ava dîke mîrov e. Welat, dewlet û jîyan bî mîrova xweş e. Wexta ko mîrov bî hevra neyar û bî şer û pevçûn bîn, bî welat û dewlet bîn jî bê qîmetî. Gotînek pêşîyê me wîha dîbê: "Bîla

dinya avabe, mirov ji xwera nav dabe." Gotinek navnetewekar (enternasyonalist) û realist. Bî rasti ko mirov bî seriki tji bî fîkîre wisa ye. Dî dinyaki angowelateki belengaz û xerabe de mirov mir bûye çî, qîmet heye?!

Mirov bî mêjiyê xwe grînpaye ye. Grînpayîya (qîmeta) meji jî efrandînên mirovtiyê tîn. Û disa bêtîrîn mirov jî mejiyê xwe berpirsiyar e. Çêyi û xerabî, paki û gemarî.. gişt jî mêji tê. Lê mêji jî xwe berda tu berhemi na efrîne. Yê mêji yê mirov û dîtîniyê mirova peyda û tayîn dîke; rewşa jiyana mirova ye. Jiyanek pêşveçûyi, dewlemend û xweş, mirova jir û qenc dîke, lê jiyanek paşdemayi, jar û jî hevketî, mirova nezan, nepak û bînketî dihêle. Disa cî dibe bîra bîbe, çand û zaniyariya cîvata bî carekî û dî rojekî de pêk nayê. Ew bî xwe dî nav pêvajoyêda û bî keda hezarê sala pêk tê.

Dewlemendiya xwezaya welatekî bî serê xwe dibe pareka çande, edebiyat û zaniyariya wê netewê. Bîramîn; lî çolekî xalî darekî sêvê hêşîn hatiye, beji û jî xweberde. Mirov, bî çîyayê bîlînd û asê ve hîldîkşîn û dîçîn sêva jê dîçînin. Paşê mirov dîfîkîrîn ko jî wê sêvê lî erdên rast û lî ber deriyê xweji bîçînin û bî hesayî jê berjewendi (men-feet) bîstînin. Ev daxwazî, mirova dîxe nav lekolîna û heta ko mirov tamamdîne (aşî) dî afîrîn û hindîbîn..

Dara sêva beji lî çolê, efrandîna xwezayê ye, lê çandîna darê lî ber derî û tamamdîna wê, efrandîna mêji yê mirov e. Û berhemek jî çanda dendi (madi)ye. Dî vê minakê (misal) de lazîmî xwe dîke ko mirov rastîyekî bîbine ko



Cami ya Selahaddin i Eyyubi

ew jî eve: Dara sêvê tînebûya tamandîn jî peyda ne dîbû. Ango, pêşiyê madde heye, paşê jî mirov maddeyê wate dîke û lî gor berjewerdîyên xwe şîkîl dîdê.

Bî kurtayî welatparêzî, hezkîrîna hemgelî a herî mezin û parastîna berhemên netewî ye. Dî serê van berheman da pîrsa çande, edebiyat, edet tore, dirok û zmên tê, Zman, mirov dîkare bêje bîbeta herî grîng e, Xweşîya berhemên çandî ewe ko mirov bî zmanê dayîka xwe bîxwîne û bînivîse, bîbêje û bîbîze. Mirov dîkare wanîjî bêje: Zmên mîfta deriyê netewebûne ye. Xweşîya helbestên ko lî ser qehremaniya Kurda tîne xwendî, romanen ko behsa jiyana Kurda dîkîn, lekolinên ko lî ser rewşa Kurdistan tîn kîrîn zêdetîr xweşîn ko bî Kurdi bîne nîvîsandî. Ne tenê xweşîn her wîha pêwîstî jî...

Gelî xwendewana, mîn hevçend gotî jî bo vê hevokê dîrêjkîrîn: "Rîknê

welatparêziyê, parastina mafên mirovayî û jêre xwedi derketina çande û edebiyata netewe ye. Ew ji di axaftin, xwendin, nivisandin û fıkrandina bi zamanê zıkmaki ye. Vi kari piçûk nebinin nabêjin pişt gohê xwe, bira neyê ji birkirin ko pêşiyê karê piçûk tê kîrin. Mirovê bi ser kare piçûk neketi, ji bin karê mezin ji hiç dernakeve."

Ez Farqin im Farqina Rengin

Ji min ra Siliva ji dibêjin, Farqin ji.. Dijmin ji "Silvan" li min bi nav kirye. Lê der û dora min, tu kes bi "Silvan" navê min hîlnade. Ev nav, navê Romê lêkiri, navê bîşaftinê tê zanin û bi zanin li hamberê vi navi kampanyeyê ji xwe berde li nav xelkê belavbûyî ye.

Farqin. En pîr ev nav li min tê kîrin. Siliva ji di bejin, lê hındik. Siliva ji ji nav rûpelê dirok min tê, lê ji ber ko bi navê dijmin lêkiri "silvan" re nêzikayi nişan dide ev nav pîr kêmtê bîkaranin. Wisa xwîya ye, gava Farqin tê gotin mirovên me piçeki kela dilê xwe hêdi dikin û hînek ji li hamber bîşaftinê xwe diparêzin, hîşyari û bawerîya xwe ya netewî tinîne zman..

Farqina rengin, di devê her kesî daye, ketiye helbest û strana. Wexta Farqin tê gotinê, pêre 'rengin' ji derbas dibe. Ji ku tê renginiya min û çewa?

Ez bajarekî gellek kevnim. Diroka avakirina min, hezar salî berî zayinê destpêdike. Gelek medeniyet li ser min ava bûne. Min gelek şer û cenbazi diti ye. Ji gelek dewleta re serbajarî û bermalî kirye. Bi kurtayî bê sedem nine renginiya min. Gelê Kurd irê ji min

ciyê ilmê, şarezayî û çande ya netewî dizane. Gelek hozan û gelek helbestvan afirine ji nav min. Min gelek şexsiyetên hêja bexşî welêt kirîye. Di hêla şerê rîzgariya netewî da ciyê min tîm bi şanû, şeref û şayan bûye.

Bilî rewşa siyasî(konevani) bi kele û bîrcê xwe, bi dêr û mîzgeftê xwe ez renginim. Çar aliyê min kele'in, bîrc'in, pîr û şikeftin. Kela zembîlfroş(ko destana evîna xatûnê têda derbaz dibe) kes nine pê nîzane. Pîra malabadê, şikeftên Hasûnnê, Mîzgefta Selaheddînê Eyûbî, Dêra disa wisa..

Semedek dîn ko ji min ra dibêjin Farqina rengin ew ji eve: Hawirdora min av û kani ne, dar û ber û şînahî ye. Bi rastî ji hevçend çevkani û avên bin erdî di bajarekî dîn da nahatiye dîtîn. Av û kaniyên min ji wekî bîrç û kelên min ketiye çanda gelêrî. Kani, ci-hekî bi taybetî tûjî dikin di jiyana gundîtiyê da. Evîndariya keç û xortên welatê min ya li rêya bêriyê, ya lîserê kaniyê ye.. Gellek serborîyên romantîk hene li ser kaniya. Helbesta "kaniya mezin kaniya dila.." gelek bi nav û deng e û li çaraliyê welêt tê xwendin û gohdarîkirin. Ji xeynî Kaniya mezin: kaniya derge, kaniya navîn, kaniya jorîn, kaniya piçûk, kaniya zazo, kaniya kelê, kaniya bêzwanê, kaniya hesûnê û çemê malabadê bi avên xweyî zelal û pîr û xweş ji ez rengin im.

Bi kurtî, gava diroka Kurdistanê tê gotin ewil ez tîm bira mîrovan. Wexta, Folklor, çande û edebiyat tê xebirdan ciyê min di serîde tê xwîyani dîke. Gava şerê rîzgariya netewî tê axaftin, disa ez in li nivê meydanê serî bilînd û

eni vekîrî...û gava kurdistan tê gotin ez
im, ez Farqina rengi me lî bira mîrova...

Werin nuha jî hîn aliyê min
nasbikin.

Erdnigariya Min

Ez dîkevîm nivê bakûrî rojavayî
welêt. Bajarê âmed û çiya yê reş dîkevîm
rojavayê min. Lî bakûrê min çiyayê
Andokê û warê dîmîllî ya, Bingöl e. Lî
başûrê min kaniya neftê, bajarê Êlihê û
qotê Rema ci distîne. U min piştî xwe
daye çiya yê Elbatê, ew çiya yê ko jî
dema destpêka erdnasi yê tê.. Jî her
demê erdnasi yê (jeoloji yê) û jî her
cûrî axa min heye, kevîr, taht û
daristanê min hene.

Gelheya min: 115.000 hezar kesin. Jî
van kes lî gunda, kes jî lî bajêr rûdînin.

Rewşa Min a Aborî

Rûpivana min: 1.400.000 berecot e
(donîm e). Jî vi erdî 850.000 berecot tê
ajotin. Erdê tê ajotin 500.000 bejî ye,
350.000 wî jî avî ye. 550.000 berecot nayê
ajotin, darîstar û kevîr û taht e.

Hêmanê berkêşana min:

Genîm 500.000 berecot

Ceh 50.000 "

Nok 10.000 "

Nisk 50.000 "

Kunci 15.000 "

Parêz 15.000 (Zebeş û gunda)

Tîtûn : 35.000 "

Bîrînc : 5.000 "

Şadaneke : 10.000 berecot

Gulêberbîro : 3.000 "

Hêmanê pişekarî (senayî): Tune
tên hesabandin. Tenê karxanekî arvan
saz e. Du fabriqê nivco mayî jî hene.

Fabriqa pembû û êmê heywên. Hedadî
wek ko bîbê "jî dijminra înad" bî
îmkanên piçûk lî ber xwe dîde. Hedad,
bî qeweta zendê xwe lî er xwe dîdîn. Lê
çêkîrî yê fabriqa pazara welat zift kirye.
Roj bî roj kêmkî dîkî û hînek jî wan
dezgê bav û kala berdîdîn û dîbine kar-
ker. Bîlî Hesinkîrîyê koşkîrî jî derîkî
rîzqê Farqîna ya ye.

Benda (beraj) Malabadê van salê
dawî rûyê çend gundîyê destê
vebîşîrand. Hêviya gundîya lî beraja
mezîna û sentrala elektrîkê ye. Çend
mîrovê maldar û pîrê wan tevkarê
mêtingehkara bî bayîti ya hîn çêkîrîna
xweş dî jin... Heywên xwedîkîrîna heye,
lê ne jî bo bazarê û ne bî pergalên.
nûjen e. Lî ber derê her malekî gundî
çend serî pez , çêlekek an gamêşek,
kerek û çend hev jî mîrîşk dîxwîyên,
bes evana tev jî bo berjewendîyê malba-
tî ên rojane ne

Dawî hejmara bê da. ■

.....

**Ey ! Kurdên lî dor destê û
çiyana şaxê û newalan**

Hun çewa dîkujîn

yarê bîra

dostê hevalan

Ku dijmin jî xwera bîstîn

keysê û fesadan

.....

CIGERXWÎN

ÇIROK Û SERPÊHATİYÊN KURDA

Serpêhatiya Siyamendê Sîlivi

Mehmet EKMEN

Bî texmini, di sedsa-
la 18'an lî dora Wanê û
dora Xelat û Adilcewazê
de: Yekî bî navê Siya-
mendê sîlivi hebiye. Xor-
teki ciwan û nêçirvan
bûye. tir û kevanê wi jî
keçel buye. Le belê gele-
ki jehati û cesûr bûye.

Lî nav wan eşîretan
da qizek hebûye. Navê
wê Xecê bûye. Qizik
gelek delal û xweşik
bûye. Xortê birayê wê
hebûne.

Siyamendê Sîlivi
dîketiyê wê Xecê bû. Bî cesûrbûna xwe,
tenê bî serê xwe, wê jî nav wê eşîretê û
wan bîra û pîsmaman de revandiye û
bîriye serê sipanê Xelatê. Sipanê Xelatê 4
hezar metre bîlînde û serê sipanê Xelate
sîpi û çiyaki gelek asê ye.

Sûwarên eşîretê, bîra û pîsmamên
Xecê jî taqîba wan dîkîn. Siyamend Xecê
dîrevîne, dibe nêzikê serê kaba Xelatê. Ew
dibetîlîn û lî ciyekî rûdînên. Siyamend serê
xwe dîde ser kaba xecê û xılmaş dibe. Du
hêstîrên gîryê Xecê dîkevîn ser rûye Siya-
mend. Siyamend çavên xwe vedîke, dînêre
û dîbine ku Xecê hûrîk hûrîk dîgiri. Siya-
mend dibêje:

-Eger dile te bî vê revê nexweşbe hêja



wext heye, ezê te vegerînim mala bavê te.

Xecê dibêje:

-Na welle, ez dînêrim ku tu yekî bî tenê,
te ez jî nav ew qas eşîra min, bîra û
pîsmamên min derxist û revand, ez jî vê
ecêbê dîgirim.

Siyamend lî dora xwe dînêre ku lî
qarşiyê wan beran û nêriyê kuvi digerin.
Dibêje:

-Xecê, her hal de dilê te çûye goştê
kûvî. A niha, ezê jî te re kuvi bikujim û
bîpêjim û bîdîm te.

Destê xwe davêje tir û kevanê xwe, û
diçe kuviyan. Ha lî wir, ha lî vir jî ber çav
diçe û tir davêje beraneki kuvi û lê dixê;
diçe ser kuvi ku şerjêk e. Wê demê, beran

qıloçê xwe (qılaç) lı Siyamend dixê û Siyamendê Silivî dî nav zinar de hildîfirine. Belkî sed metre dî zinar de lı dara benîştokê disekîne. Si dora benîştokê lı pîştâ wî dîkeve û dî singa wî de derdîkeve û nalin jê dîçe.

Qedereki Xecê disekîne û dîbine ku Siyamend nehat; radîbe û taqîba wî dîke. Dengêkî kûr nalênî tê guhen wê. Ber bî vî dengî ve dîçe û lı dora xwe dinêre ku çî binêre! Ku va ye Siyamend dî zinarê bîlind de ketîye û pîştâ wî lı dora benîştokê ketîye, dî singa wî de derketîye. Û nalin jî Siyamend tê. Ciyê ku Siyamend ketîyê belkî 40-50 metre kûr jî xwar ve jî gelekî bîlind û asê ye. Tî imkana ku meriv bigihîştîye tune. Bî vî halê perîşan û hezîn xecê gazi dîkê:

XECÊ: Siyamendo, oy Siyamendo, Siyamendo, Siyamendo

Ezê serê sipanê xelatê dîketim, bî darê benîştokê

Lê rebenê, lê rebenê ez nîzanîm, nema zanîm

ne dîl e, ne gurçîke

Ez îm, ez îm, sebebê vê navê ez îm

Mêvanê gur û çîya ez îm

Ciranê cîn û perîyan ez îm

Weyla lı mîn û vî hali lı tê bîke vî hali

Tê tembiha mîn lîkî kî, lı vî çîyayê xîr û xalî-Siyamendo (xwerû û xalî.)

Siyamendo ax Siyamendo lı vî hali

Tê tembiha mîn lı kî kî, lı vî çîyayê xîrr û xalî.

Jî nav birîna xwe kûr dînalî.

SIYAMEND: Xecê mahbûbû perîya vebîrinê

Bîrina mîn Xedar e dîşîninê

Rake lezke bîlezîn e

Berê xwe bî de bajarê Ecevedê
Cem brakê mînî Yusuf Yahudîn e
Bîla bê topîk jî topê qedek bîne
Welê mîn jî hale xerab dara benîştokê derxîne.

XECÊ: Siyamendo, dîlê mîn jî dîla dîlekî dîlo dîn e.

Ezê rabîm top bîkîm werisên heft gundîn e

Ezê gazîbîkîm xelkê heft cihîn e

Tu bala xwa bî de mirata tahtê bîlîn lo nagihîjê imkân nîne

Ez îm, ez îm mêvanê vî çaxê çîya ez îm.

Tê tembiha mîn lı kî kî lı vî çîyayê xîrr û xalî Siyamendo

SIYAMEND: Xecê, ezê serê sipanê Xelatê ketîm kelaluk e.

Bîla Xwedê Ta'ala e mala beranî kûvî xera bîke.

Qılaç mezînê qam bîçûk e.

Dest nagihî jî birînê

De serê sipanê Xelatê dest gerê zavan û bûk e.

Haylê, heylê Xecê, ezê birîndare benîştokê.

XECÊ: Siyamendo! ez wîha Sipanê Xelatê ketîm bîst û heft e.

Me go qey sala vê salê miradê mînadxuaz e.

Û miradê mîn û Siyamendê Silivî

Mîn nîzanî kû felek xayîn e jî mîn tî tere tew bê bexte

Ez îm sebebê vê navê ez îm. Siyamendo

SIYAMEND: Xecê. mehkûbê deştâ periyê vebîrinê

Dîle mîn jî dîlan dîlekî dîlo dîne

De rabe ser xwe tu jî jî xwe re

Mêreki ji min çêtir bibine
Belki xaliqê Xweda ta'ala zurriyetkê bîdi

te

Navê wi bike Siyamendê Silivî ne.
Biki darê dergûşê bihejine
Jê re bêji bîlorine, bihenwrine
Mana belki gîdî havra dîle xwe pê bine
Lê dest nagihîje birina min xedar e.
XECÊ: Siyamendo! Ax Siyamendê Silivî!
Welê tu ji guliyê tir û kevanê zivî
Ma ka dewr û dewranê ewilî
Ezê serê Sipanê Xelatê ketim bist û

şes e

Min got qêy salên vê salê
Wê Xwedê ta'ala mîradê mîradxwaz a,
Û mîrade min û Siyamendê Silivî bike.
Min nîzanî bû felek xayin e ji min û te

re

Ez im, ez im sebebê vê navê ez im.
SIYAMENDO.

SIYAMENDO: Xecê. mahbûbê deşta
periyan bî delalî

Tu bî Xwedê ki çavê reş û belek Xalî
neki ji kilê Sîbhanê

Êvare, dereng e, roka me çû ava
Wexta me ê mecal bûkan û zava
Hîl giranî, hîrç û teyrên û qaza
Bûne Xîrxîra hesp û suware tey e

Dora der û piyê teka

Nalê wan êrdê dixine

Jî te dixwazî Siyamendê Silivî

Lê lê rabe belki Xwedê bîxerki mêrki jî
xwe re bibîne weqta elî

Ez im, ez im birindarê benîştokê ez im.

XECÊ: Siyamendo! ezê lî Sipanê
Xelatê dînerim jî dûr sipî dîke wekî hêk e

Kurro êvare, derenge, tu cîkî jî min re lî
cem xwe çêke

Xecê destmal lî ser çavên xwe dani û
xwe avête ser Siyamendo Silivî

Bî emrê ilahî em jî ser darê benîştokê
Weq felekê Xayî ne çîma te lî me wa kîr
Te nehîşt destê bûkan û zava mîradê
xwe şah ne kîr
Ey felekê xayînê derewînê lê lê lê. ■

ÜLKEMDE YAŞAM

Azrailin insafına kalmış,
Nerden geldiği belli olmayan
Kahpe kurşunlar içinde
Yaşamak ülkemde

Ki leş krgaları içinde yaşamak
Sonsuz bir türküdür

Adım başı kurulan karakollar
Adım başı durdurulan minibüsler
Önümüzde, arkamızda, yanımızda
Her tarafta işkencedir, ölümdür yaşam

Güneşin doğduğu yerdir ülkem
Kırmızı akar nehirleri
Sular berrak
Çocuk gülüşleriyle,
Güzelleşir dağlar, ovalar

Bu dağlar
Bu ovalar bizimdir
Bu topraklar üzerinde
Ölülerimiz dirilir
Tekrar ölmek için

**Hakan KARAASLAN
ERZURUM**

Dormê Erzingan û Dersimi de çêyê de Begû:

ÇÊ SOSÊN BÊGÎ

Mûnzûr Çem

Mıntıqa ke wertê Erzingan û Erzurım û Dêrsimi de manena, a mintıqa de çêyê de begû esto, cı ra vanê "Çê Sosên Bêg", Çê Sosên Axay" Ya ki "Çê Miri(Mirêy)". Çıqaşı ke ewro halê welatı vuriyo, têsirê dîne zê virêni niyo, tenê biyo kem ki, hata dormê sera 1938 ine qeweta xo zofe biya, têsirê de gırs do mintıqa.

Tarixê çê Sosên Bêgi ser o vatenê esta. Na vatene çıqaşı rast a, çıqaşı sas a tam nêzonen. Çı ke ser o çiyê nêamo nusnayêne. Çı esto ke isonê ê dormi, tê de aye rast zonenê û ser o qesêy kenê.

Na vatene ra gore, Sosên mordemê a mintıqa niyo. Eslê dêy, dewa Paloy Govdere ra wo. Nika Tırki name vurno ra kerdo "Gökdere".

Amayêna xo ki eve na şekıl bena. O ve cênika xo ra têynay benê. Zu ki gayêde xu yo bor beno. Rozê urzeno ra qatê cilû, tayê qav-qecaxû, zengen û kurge nano ro gay bar keno û kuno ra raye. Eke êno mintıqa Plemuriye, cayê de eraziye da rindek e vêneno, te de nano ro. Namê uzay deste bena.

Endi Sosên Axa ke uza eve o qêyde nano ro, roza bine sodır isonê dewonê dormi ênê-sonê, niya danê ke mordemê ha wo zenge gureto hard kıneno. Pers kenê vanê:

-Tı kama, çu wa-çi ka?

O xo dano naskerdene. Vano:

-Ez Govdere ra ên. Mı hewnê xo de Kalo Sıpê(1) di. Êy mı ra vake ke `Urze ra gayê xu yê bori bar ke, era raye kuye so. Gayê to ke koti mexel bi, uza kergebine(2) xo piro de.

Na vatena dêy ra dime, xelki vato ke:

-Eke hênıyo no mordemê de rınd o, terefê heqi ra, terefê Xızırı ra amo rusnayêne. Hem ki aşıra ma ra wo, Çarekız o. Ma gereke yardım cı dime.

Isonê ê dormi Kalê Sıpêy û jayaronê binû ra ki zof hes kerdo.

Hem na sevev ra, hem ki uyo ke o mordemê de xam biyo, amo werte o sevev ra, biyê topi, şiyê yardım kerdo, cı rê bonê de rindek virasto. O ra dime na ra ki her kêş gorê qeweta xo çiyê werdene, mal-gay, qav-qecax, cılı, astırı û çiyê henênê bini dê cı. Mêrik eve na qêyde ra biyo vayirê çêyi. Pêyê conı, na ra ki têpiya sava xatirê Kalê Sıpêy û xatirê mordemêni, cı rê karo bin kerdo. Vajime ke hegayê dêy ramitê, hekinê dêy çinito, cı rê con çarno, nonê dêy berdo areye û çiyı bin.

Pênıyede hen biyo ke hekinê dêy, malê dêy û Ron-toraqê dêy cı rê zêde amo. Tavi eke zêde amo ki dest no pı ra roto. Eve o qêyde perêy kewtê ra dest, roz ve roze herçi ke şiyı halê xo biyo rınd, biyo dewlemend.

Naza de noxtê da muhime esta ke gereke mordem ser o vindone. Waxto ke Sosên amo uza, heto zu ra xo aşıra Çarekû ra do naskerdene, heto bin ra ki vato ke "Ez Elevi yu ne". Hama rast a xo henêne bena nêbena, a eskera yê niya. Çı ke mintıqa Govderi de ne Elevi estê, ne ki Çarekû. Eve namê Parsiyon(3) dewê esta, vatene ra gore isonê a dewe, eve se serû ra avê Dersim ra şiyı. Hama ê ki ewro sunni yê. Êhtimalê esto ke Sosên Axa a dewe ra biyo, isonê uzay verê coy Elevi

biyo û hona o waxt Êlevênî terk nêkerda. Hama êhtimal ê de bin ki esto ke Sosênî qurnazên kerda, o cawo ke tê de no ro, zono ke xelkê dormê uzay tê de Elevi yê û Çarekû uza zof ê, xo hen do naskerdene. Çi ke hen oseno ke Sosên, mordemê de qurnaz biyo.

Na ra Çê Sosên Axay Kalo Sîpê ki xo rê wayir(4) hesavno. Sondê xu yo en gîrs, her tim dêy ser o werdo. Hata na seronê pêyênû ke çê dine de, eke juy sond werdo vato:

-Kalo Sîpê bo. Ya ki "Servê Kalê Sîpêy bo"

Waxto ke lingonê xo rind hard gureto, mal û milkê xo, perê xo biyê zofi(zafî), Sosên Axa na ra ki şîyo Erzinga, wasto ke dewlete de alaçe girê do. Tavi aspor şîyo, çekdarê xo biyê, ê têt berdê, yanê hen kerdo ke mordemê dewlete bivêne ke, o ju yo ci ra ama wo û wayirê qewete wo. Pêniye de têt alaçe girê do, hêrçi ke şîyo wertê xo biyo rind. Hata, tayê vanê ke şîyo Estemol Sarayiya Pasayê Osmaniye, uza dine de ki qesêy kerdo. Eve na çeşit mênîk dewlete kerda hetê xo, têsîrê xo roze ve roze kerdo zêde. Xelk kewto binê destê dêy, qesê xo biyo zê qanûnî, eke sevato milîti hen kerdo û herçi ke şî, ci rê zêde gureye.

Waxtê ra dime Çê Sosên Bêg, hurênda konaxê xo vurnenê ra destê ra nêjdi cayê de bin de konaxo newe virazenê. Namê uzay ki kenê Şênîaxû. Naza de wazen ke na kelimê Şênîaxû ser o ki di-rê çekuyû vajîne. Şêne, heto zu ra parçe de lesa isoni wo, heto bin ra ki na cayê ke rast û duz ê, hama hen ze tenê şuy û pilê xo ki estê, dine ra vajino. Naza de bêlu beno ke kelimê Axû(axawû) ki Çê Sosên Axay ra gore ardo pêy, eve o qêyde kerdo Şênîaxû. Heto bin ra ki beno ke şênî, kelimê şenayi ye ra bêrone. Eke hênêno o waxt mana xo êna şenayi ya Axawû.

Sosên Beg ke merdo, na ra ki sermiyanênî kewta ra lazê pil Hêydêr Bêgi dest. Hêydêr Bêgi roza juye de mêyitê



piyê xo dardo we, roza bine biyo aspor, tekito şîyo Erzinga. Uza dewlete de qesêy kerdo, xeverê da ci ke merdena pi ra dime hukim kewto ra dêy dest, o hurênda piyê xo der o. Ora dime ki şîyo Estemol, Sarayiye de qesêy kerdo. Pêyê conî dewlete Miralayên da ci. Tavi miralayên a dêy, wertê ordiyê dewlete de nê, wertê Kurdû de biya. Yanê, vajime ke eke rozê dewlete herv kuyo, ya ki çiy de henêno bin bibo, ci rê eskero zêde lazîm bo, gereke Beg isonê ê dormi top kero, qumendarênî ki bikero û şêro binê emrê dewlete de herv kuyo. Miralayên a xo eve ne qêyde bena.

Eke wertê çê Sosên Axay û dewlete niya honde zof biyo rind, na ra ki dest no pi ra, dewû xo ser o tapu kerdê. Çê Bêgi, heto zu ra memurê dewlete ardê, heto bin ra ki isonê ê dewû de qesêy kerdo ya xapitê, ya ki eve tersnayêne milkê dine kerdo ê xo. Hata tayine ra ki şinate(senete) gureta ke, ine eraziya xo eve vatena xo ser rota ci. Hêydêr Bêgi waxto ke milk eve na çeşit xo ser o tapu

kerdo, dayma isonê dewû ra vato ke:

-Ez na dewû xo ser o tapû ken, heq nêkero milkê sima sima ra nêcên. Milk têpiya onca ê sima wo. Çi esto ke dewlete mî naskena, eke mî ser o bêro qêydkerdene, tenêna rind o.

Hama qesêde Hêyder Bêgi wo bin esto, mordem gereke êy ki binûsno. Miri her tim vato ke:

-Eke çond rozê sere estê, gereke honde dêwê ma bibêne.

Na ra tapukerdena dewû ser a ke tenêna waxt vêreno ra, Mire na ra ki fetelino, ya ki êlçiyonê xo rusneno vano ke:

-Ez sima dewû ra tever nêken. Hama çiqas ke gay û toxim ê sima yê, sima gurêyenê, hemeg danê cî ki, milk ê min o. Sima gereke sere ve sere heqa mî bîdê mî.

Eve na qêyde milêti ra mal-gay, rû, hemgê û zovî çiyê henên ê bin vergi guretê. Hama zêde ki zerni wastê. Xel mecbur biyo, vatenê dêy tê de ardê hurênd. Çi ke heto zu ra çekdarê xo zofê, heto bin ra ki pošta xo sana dewlete. Kes besenêkeno ke dust de vêjiyo, çiyê vazo.

Tavi waxto ke Çê Sosên Axay niya biyê dewlemêndi, hukimê xo biyo zof, têsir no ro dormê xo ser, biwazê mewazê wertê. dine û axawonê binû û pilonê aşironê ê dormi beno xiravîn. Çi ke avêşiyayêna Çê Sosên Bêg, têsir dana dine, mênfiyatê dine re ki bena xiravîn e. Uzay ra gore ki ê na het-do het ra zuvini de qarinê, ge-gane eskera, gane ki dizdiya dîsmenayên i kenê.

Xo ra Çê Sosên Axay ki çiqas ke dest ra amo, nêverdo ke dormê xo de axay û bêgê bin zêde sare we dar ê ne.

Beg û axayê ke çê Mirêy de kewtê tê, dine ra zu ki Xêlil Bêgê Fême biyo. Fême Şênixû ra nêjdi ya, eraziya xo hira wa. Mal û milkê Xêlil Bêgi, perê xo xêlê beno. Hama Heyder Beg, çim verdano cî ke Fême ki era xo dest fiyone. Uzay ser o ki wertê dêy û Xêlil Bêgi de lez tê ra beno, xiravî ye kuna werte. Uzay ra gore ki Hêyder Beg wazeno ke êy bîdo kistene. Çi esto ke çiqas ke fetelneno, dest ra nina, besenêkeno.

Zamanê ra dime na ra ki Mire ve Xêlil Begi ra iqrar danê zuvini, benê mîsayiv.

Na ra heto bin ra, Çê Miri dayma ûsulê de bin ramito. Waxto ke juy de kewtê tê, eve dîsmenayêna eskera ye bese nêkerdo zercî dê, o waxt têy dostên girê da, biyê nêjdi, eve o qêyde karê xo berdo ser. Vatene ra gore sevevo ki Heyder Begi, Xêlil Beg de mîsayivêni gureta, o ki na sevev biyo.

Feqet, mîsayivên ra dime onca ki wertê hurdine rind nêbeno, ge-gane eskera, ge-gane ki dizdiya dîsmenayên devam kena. Na ye ser o ki Hêyder Beg mordemû keno werte, Xêlil Beg rê xevere rusneno vano ke:

-Ma birayêna axrete girê da, mîsayivi me. Iqrarê Heqî wertê ma de esto. Ma çinay ser o zuvin fetelneme? Bêro ma bême hurê.

Eve na qêyde qerar danê cî, sonê Gola Boyêre(5) de qirvanû sare birnenê, sondî wenê, ênê hurê. Endi gereke a roze ra dime xiraviye wertê xo ra we dar ê, zîdê zuvini de çiyê mekerêne.

Hama Hêyder Beg nêtê xo terk nêkeno, Xêlil Begi dano taqivkerdene. Xo ra Xêlil Beg ki itimatê xo eve Miri nêano, dayma cî ra sık keno. Pêniye de Miri niya do ke Xêlil Beg payiz ve payiz êno Xivêre, uza sole hêrneno. Rozê memurê dewlete ke a sole ser o wo êy vêneno, têy qesêy keno vano:

-Eke mîsayivê mî ama naza, egle ke, xevere ki bîdê mî, ez ên silayîye ken ben çê xo.

Tavi wexto ke hen va, gereke memur a vatene dêy biya ro hurêndi. Dêy dest ra çiyê de bin nino. Texmîn ra gore memuri, nêtê Hêyder Bêgi ki nêzono. Pêniye de rozê xevere rusneno vano:

-Mir ra vazê, Xêlil Beg na wo amo naza, mî silayîye da cî çê mî de mêymanano.

Na ra o ra avê ki mordemê de xort beno, cî ra vanê Memê Êlyaşi, xortê de zof cî ra amaye û çêr beno. Mire êy vêneno vano ke:

-Karê esto êy hal bike, çêna xo dan to. Memê Êlyaşi zoneno kistenê da juy esta, pers keno vano:

-Kamo?

Mire vano

-Xêlil Bego misayivê mın o.

Memê Êlyaşi soz dano cı, vano:

-Temam kisen.

Ê rozû Miri xevere da Memê Elyaşi, o ki ardo çe xo.

Eke memuri ra xevere êna ke Xêlil Beg amo sole ser o wo, taye mordemonê xo rusneno lewe, vano:

-Misayivê mı, mı ver ra selam kerê vazê `Misayivê to qonax de to ser o wo, vato va bêro esmo mêymanê mı bo".

Eke xevere hen sona, Xêlil Beg urzeno ra teknenê sono Çê Miri.

Çi esto ke cêniya Hêyder Bêgi nêwazena ke misayivê xo bê ro kistene. Uzay ra gore ki fetelnena ke eve çêşitê xevere cı do, hesar bike ro ke hayı ro xo vındo. Xêlil Bêgi, saate de rınd fam kerdo. Waxto ke saati biyê xıravın, êy têy niya do, vırastê. Uzay ra gore ki misayiva xo cêniya Hêyder Bêgi, saata xo, xızmetkaronê çêyi ra dana juy rusnena, vana ke:

-Misayivê mı mı ver ra selam ke, vaze misayiv a to vana `Na saate rınd nêsona, hala têy niya do, çikê xo esto? Çi ra hen kena?

Xêlil Beg saate keno ra têy niya dano, pêyser rusneno vano:

-Misayiva mı selam kerê, vazê `Saate rınd a, tuwayê xo çino'.

Xızmetkar saate beno dano cı, werte ra ke tenê waxt vêreno ra, a rêyna saate rusnena. Vana ke:

-Na ye bere misayivê mı de cı ra vaze, misayiva to vana ke `Na saate rınd nêsona, rınd têy niya do'.

Xêlil Beg cêno onca têy niya dano, pêniye de ki saate rêyna pêyser rusneno vano:

-Saate rınd a, çiyê de xo çino.

Nino aqıl ke misayiva xo çı ra a saate rusnena, hen vana.

Eke sewe tenê vêrena ra, Memê Êlyaş urzeno ra, nano Xêlil Bêg ra uza kiseno. Çi turi ke kiseno ki remeno sono. Çê Mir ki verê coy xo nanê ro nêzonayêne, vanê:

-Memê Êlyaş ame naza na pı ra kist, rema tekıt şı. Sucê de ma çino.

Çi esto ke kes ima nêkeno, na qese rast nêvêneno. Werte ra ke tenê vêreno ra ki, her çı beno eskera. Zamanê ra têpiya Hêyder Beg çêna xo Jano Memê Êlyaşi.

Kistena Xêlil Bêg ra dime, zerê xelkê ê dormû hêrçi ke şı Miri ra beno serdın, cı ra nefret keno. Çı ke heto zu ra Xelil Beg mordemê de hewl biyo, heto bin ra ki misayivê Miri biyo û Miri eve xapnayis berdo kerdo mêyman, çê xo do kistene. Uzay sero wo ke, na merdene ra dime, Xêlil Begi ser o kılâmê êna vatene, a kılame eve niya dest nana pı ra:

Mire Mire

Xayın o Mir o

Bêbextêni meke

Dismenê to Xızır o

Çi esto ke tesirê Çê Miri onca ki roze ve roze beno gırs, kes besenêkeno ke ver a dine vındo, çı ra qesê vazo.

Waxt vêreno ra, Hêyder Beg endi beno kokım, beno nêves, beno gıran. Daye de, bırayê xo Mistefa Beg ve Hesên Begi ra ki ser o benê. Têpiya Memê Êlyaşi ki uza beno.

Waxto ke halê Hêyder Begi zêde beno gıran, niya dano ke endi mireno, kilitonê xezna vezeno, erzeno wertê oda. Kilitê xezna hata a deqa dêy de benê. Çi esto ke kes nêjdi nêbeno, kilitû nêcêno. Çı ke Hêyder Beg pilê çêyi yo, keto ruy ver; waxto ke Beg o hal der o, eke kilitû bijê rê, êno o mane ke, o ca verdo kewtê derdê peri..

(1)Kalo Sıpê: Namêyê de Xızır o bino.

(2) Kergebine: Manê xo temelo ke saxlem o, u yo.

(3)Parsiyon, parskerdene ra êno. Yani çıyo ke eve zor, kelepur ra kuno ra cêst u yo. Ew ro namê na dewe eve Tırkı Kırkbulak.

(4)Hetê Dêrsimi de ûsulê aleviyên ra gore, tayê çêy xo rê jıayerê, melakêyê zê wayır qewıl kenê û xo girêdayiyê dine hesav kenê.

(5)Gola Boyere Hetê Plêmrûiye de jıyarê ra.

(6)Hesên Axayê Suru, sera hiris û hêştine de şı çê vistewronê xo, yanê Sosên Bêgi, heqivê zerni gurêti ardi ke qimendaronê Tırkû do, xo bixelesno. Nazmiya de eskêr rastê cı amêy berd Dayra Cendermû, zerni gurêti, o ki a sewe uza kist. Têpiya wertê dêy û dewlete de ki qe çiyê çinebi.

Devamê xo esto

EMÊ GOZÊ

Ez Emê Gozê me
Bavê min hevalê Zal.
Min bı Rostemra rakiriye şûr
Ez neyarê dêw ê hût im.

Ez Emê Gozê me
Rehevalê Mirze
Gernasê dilê zarokan
Bı serpêhatiyên me raketin tım
Zarokên Kurd û Faris û Erebo
Mêrani bise lı wir (!)
Me çêkir sed hezar fen
Me çêkir ilmê evinê

Ez Emê Gozê me...
Hevale Silheddin
Silheddin ê Eyûbi
Bı herfên zêrrin kolaye nave me
Lı rûpelên diroka kâl û pir
Em xwediye huner û çanda hêja
Bı ditnên me geş bû dinya

Ez Emê Gozê me
Hevalê Bedirxan Beg ê Boti
Dost ê Seyda Ciziri
Dı sed saliyêda dilê min xort
Dı hezar saliyêda evindar

Ez Emê Gozê me
Hevalê Qadi Mihemmed
Lı Meydana Çarçirê
Dayika Niştiman lı ber çavên min
Mı sond xwar

Ez namrım
Ez her dem şervanım
Şervanê riya azadi

Ez Emê Gozê me
Hevalê Şex Seidê Kâl
Bıla çinarên kevnar pesnê min
bıdın,
Bılo bircên Diyarbekir
Ezım tēm xewna cellad
Ezım kelemê çavê dijmin

Ez Emê Gozê me
Dı Zindana Diyarbekir da Yılmaz
Dê bijim hezar salan

Ez Emê Gozê me
Ez merxase kî, bı nav û deng
Ezım, ez Kurdım loo...

Mıcoyê Qulpi (Pasûrî)




Ji bo Zarokan



FABL

CÛDÎ CIZIRÎ

Carek hebû ji cara
 Rehme li bavê guhdara
 Hebû dehlek pîr mezin
 Hîrç û kêvroşk û bızin
 Zurafe, teyr û rovi...
 Têda dijin hemû kovi
 Herder xweş û her bihar
 Kulilk, rihan û Gulzar
 Çûkê spehi renga reng
 Wek bilurê xweş da deng
 Her tişt hebû dixwarin
 Fêki, giha, vexwarin
 Dîherki li her al
 Ava kaniyên zelal
 Bes tu caran ne şadbun
 Ji bo ku ne azad bûn
 Hebu şêrek zor û xurt
 Hucûm dikir wan digirt
 Dî xwar dikir qet û qet
 Rehm ne dikir wey bêbext
 Heywan hemî gihan hev
 Hûr û gir pîr û can tev
 Gotin ew çi heyat e
 Weki mîrî li memat e
 Em nikarin bi qeliqin
 Her gav bi tîrs, û qeliqin
 Xezal go "Pîr bû zor
 Tîm sêr dike qore qor
 Diwêm bi binî çar e
 Nexwe nine mîhwar e"
 Kêroşk ê daye cewab



Got; "şêr bi lep û kullab
 Emê çawa bîşin e
 Ka bersivê bîşin e
 Mamê rûvi kîr bilind
 Dengê xweyê xweş û rind
 Go emê herin başêr
 Emê bîdnê xweş bixêr
 Bejnê gelê şahinşah
 Rihê me nek xweyi gunah
 Emê binine her wext
 Xwar, vexwara tê ber text
 Emê kîn Qurê dori
 Li kî ket wê bê gori
 Şuna her roj dil bi tîrs
 Gotin başê hûr û gîrs
 Paşê gotin ey rûvî!
 Gava ko tu herî ba ewî
 Tu aqil şehrezayî
 Xweyê sîrrû razayî

Go qebûlîm lî bî şertê
 Fil jî bê çim ser piştê
 Rovi fil hîlkîşan
 Tîrs jî dîlê xwe kêşan
 Hatîn diwana şêrê
 Zaf hurmek kîrîn jêrê
 Rovi go mirim selam
 Şêr rijand hem û kelam
 Qral qebûlkîr qerar
 Go jî sozê neyên xwar
 Her roj demîk kîfş û bel
 Sîfrê binîn ey guhbel
 Şêr vezeliya her lîmal
 Xwar nimet a tat e bal
 Kovi serbest digêran
 Dema dor ne bu ya wan
 Rojeki kêvroşk bu qar
 kîr bare bar, zare zar
 Dawiyê nêrî nebi
 Go divê kêrî xwe bê
 Pişkê dereng çû bî qest
 Şêr bî guhî girt bîr dest
 Go ka xwarê min binîn
 Mir va lî vêde dimîn
 Pîr hûrî nagîre dîdan
 Jî çeng û ser û her dîran
 Kewroşkê lê vegeand
 Got ey qîral me inand
 Xezalek gelkî şepal
 Marî û şeng û delal
 Derket pêşîya me yek şêr
 Xezal revandê bê xêr
 Şêr girtê hês û xezeb
 Ma hene jî bîl min ecêb?
 Ezîm serdar ezîm şêr
 Dîl hesîn û dîl biwêr
 Go em bigrîn bî êrîş
 Jê vekîne çerm û rîş
 Bîstînin heyf û serê
 Da kes hule newêre

Çûne ba birekî kûr
 Şêr bî himhîm her dîzûr
 Kewroşkê go ya emîr
 Şêrê dî va lî binê bir
 Şêr hîlkîşa ser diwêr
 Da binê birê binhêr
 Eksa xwe dî libînê av
 Go va şêrêk bêzîrav
 Xwe qevast ser berjêre
 Hîngê dibîrde mire
 Kovi tev ketne govend
 Jî keyfa hîldan dest û zend
 Çêkîrîn qesrêk bîlînd
 bu kewroşka eqîlmend
 Danîn serderê tablo
 Nîvistîne tê wîlo
 "Ev seraya hîzîrmend
 Kewroşka zaf hunermend
 Kari bî fikre kî rînd
 Şêrê bî quwet û kund"

KURDISTAN

*Kurdîstana min
 Çar perçe
 Çar perçe xwîn
 Ê hêsrhe Çavan
 Gîrî, gîzî û hawar*

*Ala wî kesk û sor û zer
 Lî ser seran, lî ser çavan
 Dihejîne bayê zelal.*

Ilhan KURTAY

X A Ç E R Ê Z

ÇÊPERAST

1-Roja 20 t  ilon  l  Amed , j  ali   kontra-gerilla va hate qetilk  n. Hunermend   niviskareki h  ja b . P rtuk  wi: Birina re , Q mul. Nav   pa nav  wi     . 2-M n - N t k, fers ni, j  biruyan berjort . 3-Dost, ew  ku derd   kul n xwe b  hewra parve d k n. Palan  hesp  (bere pa ). 4-Fedi, eyb - Kul,   , nexwe i.


5-Ciy  pez do   - Torbe, kis,   wal 6-Ser b xwe, azad, hur - Ne ba , koti, pis. 7-Bex , borin ef  8-N ri, m r  b z n  - h    , d  daristanan da hene.

BERE JOR

1-Ew bajar  Kurdistan  ku cum-huriyeta Kurdaya yekemin b  nav 

wi t  got n. 2- emek  Kurdistan  ku j        Bingol    Poletokan da d z    diherike gola Hezar  . 3-M w ki - Ciy  beza ereban otomobilan 4- R zgari, serbesti, serboxoyi 5- B  t rki dest - Xweli, ax 6-Gor din  Isl m  j  bona qebulk r na roji  , ew xera ku m rov ber  id  mecb re b de. 7- L  gunda t da nan dip  j n 8- N t k, fers ni - L  M s r  xweday  k 9- Bajareki T rkiy , yek  l  q rax  behr a re  - Giraniya ku meriv d de pi ta xwe.

1 2 3 4 5 6 7 8 9



P KEN 

QENE J  C NAR  XWE NEBE

Rojek cam rek ceh  xwe dad   r  k z (karaz)   datine der  mal . Cong  wi t  dikeve ser ceh   d xwe. Conge her ku ceh d xwe, ceh k m d be. Her ku ceh k m d be kuz j  kurd be   ser  conge dikeve hundur  k z   t da as  d be   dernakeve. D be oreora conge   xwedi p  d hese.

Cam r t  m ze d ke   wezyet  f hm d ke. Ew l  b  dest  p d d keve, d ke nake n kare ser  conge j  k z derxine. D f k r    b ryar d de ser  conge j  d ke   j  cendek  wi d  tine. L  disa j  ser  conge j  k z dernakeve. D bine ku  are tunine, tine k z d    n    ser  conge j  k z dertine   dav  e ser dara.

Gava zarok  cam r p  d hes n t n l 

ser  congey  j  k r  m z d k n, l   av  wi y  belek  b  h s r dinh r n   b  deng k b l nd dest b  g r  d k n. B  ziz b na deng  g r y n zarokan va der   cinar b  b yer  (mesel ) d hes n. Yek j  cinaran hers d be ser cam r   d b ;

"Hey mal x rab te ber  k z b -   kanda gene tu j  cong  xwe ned b ."

Cam r h rs d be   dest dav        r  xwe   d v ;

"Madem te ev zan b    m te ew l  nego gene ez j  cong  xwe ned b m." Cinar n dor  z t rki d kev n nav    yek cinaran l  cam r d ke q  rin   d b :

"Lolo mal x rabo, hem n conge    gene j  cinar  xwe nebe!"

DILOVAN

BANG

Govend ji hunermend û hozanvanê hêja Eskerê Boyik ra bî rih û can he-meza xwe vedike û dibe tu bî xêr hati. Û ji temami hozanvan, lekolinvan, edebiyatnas û zanyarên kurd ê lî her çar parê dinê ra bang dike:

Wek mamoste Boyik ji dibê; Armanca Govendê ewe ku bibe pire; bona me-denyet, hunermendiya kurdi herçar parê dinyê, wan bighine hev û Ameda Rengin. Ji bona vi şuxilê granbaha bike navend.

Govend û Amed lî benda we ne
Bî silavên biratî!...

GOVEND

Jî Redaksiyona Kovara Govend ra;

Birayê eziz,

Mî 4 hejmarê kovara we stend. Bawerkî dî nava çend rojan da çî ku bî zîmanê kurmançî bûn, gîşk xwend. Hin cûrê nîrîrandîna kovarê, hin şikil mî xweş hatin.

Bona destanîna we bîmbarek dîkîm, jî we ra serfîrazî dîxwazîm.

Mî dîxwast Govend bîbya kovare-ke usa ku, tê da bahata xanê dêmê ede-byet û medeniyeta me ye pîr qurneye dewlemend.

Halê Kurdistanê yê iroyîn, perçebûna welêt, tunnebûna dewletê,

dînyayê da belabûna Kurda ra girêdayî gele tîşt hatîne efrandinê; kurdi hatîne neşîrbûnê lê gelekî ra ne eyan in.

Govend, xwezîla bîbya pire; bona edebiyet, medeniyet, hûnermendiya kurdê herçar parê dinyayê, wan bîghanda hev.

Wê baş be, wekî cîkî fireh bîdne ede-byetzaniyê.

Ezê jî we ra timê bînivîsîm. Hazîr îm bîbme mîqaledarê we, lî welatêd Sovetê yê berê. Bî silavên biratîyê.

Eskerê Boyik

GOVEND

Kovara "Govend" ra

Govenda me hevtrengê,
Kîlama me hevtdege,
Rabîm poçîkê bigrîm
Hela hê ne derenge

Reqasa me grane,
Welatê me meydane,
Lî meydanê minî çîya
Xweş koçerya mêrane.

Qayde tevi hev bûne,
Sazbend hev berev bûne,
Govend bûye keske sor
Reqaşçiyê me zef bûne.

Govenda me hevtrengê,
Kîlama me hevtdege,
Rabîm poçîkê bigrîm
Hela hê ne derenge.

Meremê me azaye,
Xweda hela ne daye,
Serxwebûna gelê me
Ax gelek paşda maye.

Xemîline beryê me,
Dîreqîsîn zeryê me,
Zanîm ese dewat be
Van roja ber deryê me.

Govend bîkşe bê mînet,
Hîşyar bûye wê mîlet
Tê bîgîjî roja nûr
Sîba tera bereket.

Eskerê Boyik

29.07.1992 Yerevan

